

**ARMANC**  
Jî mehê  
carekê  
dertê  
Hejmar: 109  
Çirîya Pêşin  
1990  
Buha: 10 Skr.  
3 DM

# Armanc

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALİZM


**ARMANC**  
Monthly  
Kurdish  
Magazine  
No: 109  
October  
1990  
Price: 10 Skr.  
3 DM

Di Girtixanan de

## Pêlên Grewêne Birçibûnê yê Nuh

□ □ Piştî ku 95 girtiyen siyasi ji hefsa Diyarbekirê surgûni hefsen Anadoluyê bûn, di gelek hefsan de girtiyan dest bi grewen birçibûnê kirin. Li derva jî, li gelek bajar û qezan, bi sedan kes ji bo piştgiriya girtiyan ketin grewen birçibûnê.

□ □ Li Qezê (Kiziltepê) û li Nisêbinê esnafan bi seetan dikanen xwe girtin. Timen leşkeri bi çakûç û balyozan miftêne dikanan şikandin.



Li Diyarbekirê bi sedan jin ketin grawa birçibûnê

Ev serê 10 sala ye ku girtiyen hefsen li Kurdistanê û Tirkîyê û bi taybeti jî girtiyen hefsa Diyarbekirê li dijî zulum û zora rejima faşist a kolonyalist bi tevgeren cûr bi cûr li ber xwe didin.

Di destpêka meha Çirîya Pêşin de disa 95 girtiyen siyasi yê hefsa Diyarbekirê û 21 girtiyen hefsa Bismilê surgûni hefsen Anadoluyê; bajarê Çankiriyê, Tokatê, Yozgatê û Nevshêhîre kirin. Li dijî vê neheqî û bê huquqiyê di 7'ê Çirîya Pêşin de di hefsa Diyarbekirê de Tipa E -125 kesan û di hefsa Merkezê de ji 100 kesi dest bi grawa birçibûnê kirin. Di demek nêz de pêla grewen birçibûnê li her derê welêt belav bû. Li Diyarbekirê, Cizirê, Adiyamanê, Entabê, Nisêbinê, İdlî, Şirnaxê, Adenê, Mersinê, Sweregê, Ceyhanê, Meletyê, Bartînê, Amasyayê, İzmîrê bi sedan jin û mîr, keç û xort ji bo piştgiriya girtiyan ketin grewen birçibûnê. Ji merivîn girtiyan zêdeyî 120 kesi li Diyarbekirê di avahiya Partiya Sosyalist de dest bi grewen kirin. Ji wan hinekan piştî 15 rojan grawa birçibûnê, qulubandin grawa mirinê.

Di 29'ê Çirîya Pêşin de li Nisêbinê polis êris bir ser kesen ku ketibûn grawa birçibûnê, 3

### Liberxwedana bi qerardari dijimin anî rê

r: 2

Pêşin de dikanen xwe girtin. Dikan heta 12'ê nîvro girtî man. Timen polis ketin alarme û bi çakûç û balyozan dikan vekirin. Zêdeyî 4 hezar esnafen Nisêbinê ji di 25'ê mehê de ji bo piştgiriya girtiyan; dikanen xwe girtin. Wek li Kiziltepê li Nisêbinê jî leşkeran bi balyoz û çakûçan deriyen dikanan şikandin.

Komelê Mafê Mirovî, Baroyen Awûqatan, Partiya HEP, mebûs, hunermend, artif, niviskarê Tirk ên pêşver û û demokrat bi tevgeren cur be cur piştgiriya xwe ji girtiyan re nîşan dan. Sekreterê Partiya HEP İbrahim Aksoy û

mebûsê ANAP'ê yê Mêrdînê Nuredîn Yilmaz li Diyarbekirê kesen di grewê de bûn ziyaret kirin. Nuredîn Yilmaz got ku, "ezê mesela girtiyan bibim Meclisê." Grûbek hunermend û niviskarê Tirk ji cûn Diyarbekirê û kesen ku di grawa birçibûnê de bûn ziyaret kirin. Serokê Baroya

Diyarbekirê Abûqat Fethî Gümüş di beyana xwe de got ku "heger zulum bi vî hawî dom bike emê du rojan nekevin dawêne girtiyan, û ku cardin jî ev daxwaza me nehat cî, îcar emê cuben xwe li xwe nekin."

Piştî derketina Biryarnama Sansûr û Surgûnê cara pêşin e ku bi girseyî girtî li dijî zordariye serê xwe radikin û di raya giştî de jî bi hawekî girseyî ji wan re piştgiri tê nîşan dan.

Gava rojnama me ket çapê, grewen birçibûnê hîn dom dikirin. □

## Konferansa Stockholmê hat paşdexistin

Konferansa Navnetewî ya Stockholmê ku wê di navbera 2-4'ê Çirîya Paşin de (November) li Stockholmê çêbîbuya, hat paşdexistin. Li ser sebebê paşdexistina Konferansê, em li jêr beyana Serokê Komîta Swedî ji bo Mafê Mirovî yê gelê Kurd C. H. Hermansson çap dikan.

Ji hemû Vexwendîyan re  
Li ser paşdexistina Konferansa Navnetewî ya derbareyê "Nasîna Mafê Mirovî Kurdan"

Komîta Swedî ji bo Mafê Mirovî yê gelê Kurd, bîyar daye ku konferansa navnetewî ya li ser "Nasîna Mafê Mirovî Kurdan" paş de bixe. Konferans di şuna 2-4/11/1990'an de wê di 15-17/3/1991'an de bicive.

Tevgeren siyasi yê Kurdan û rîexistin û muesesên wan eleqeyeke gelek mezin şanî Konferansê dane. Lî mixabin bersîvên ku ji hêz û şexsiyeten navnetewî hatine, gelek kêm in.

Çima? Em baş pê nizanin, lê wisa xwiya ye ku rojênu ku me ji Konferansê re vejetandine(ji ber gelek sedeman) rastî wexteke baş nehatine.

Em besdariya hêz û şexsiyeten enternasyonal, ji bo bicîkirina pirsa Kurdî di rojeva navnetewî de, gelek pêwîst dibînin. Em hêvidar in ku paşdexistina Konferansê wê mecalê bide van kategorian ku bikaribin besar bibin.

Bi hêviya besdariyeke fireh û konferansake serketî.

(...)

(...)

C. H. Hermansson  
Serok  
21. 10. 1990

## Alfabêta Kurdi rûpel 6-7

Serokê Komelê Mafê Mirovî yê  
li Kurdistanê:

"Şer li dijî Iraqê wê herêma  
me bike warê ceribandina  
çekên kîmyayî"

Berpirsiyaren Komela Mafê Mirovayî yê Diyarbekirê, Sêriê, Wanê, Urfayê, Tunceliyê û Adiyamanê roja 15'ê Îlonê li Diyarbekirê civînek çekirin û di dawîya civîna xwe de beyanek müşterek derxistin ku li ser rewşa welêt û ya herêmê radiweste.

Beyan li ser rewşa herêmê û krîza Delava Besra dide xwiyakirin ku divê ev krîz ne bi riya

ser, li bi riya aştiyê bê helkirin û dide xwiyakirin ku ew li dijî wê yekê ne ku Tirkîye li rex Amerika, li hember Iraqê têkeve ser.

"Bi emrên emperyalîstan besdarbûna Tirkîye di şer de li hember Iraqê" dibêje belavok "wê bibe sedemê mirin û seqetbûna geleq insanan û her wiha wê fatûra rewşa aborî ya ku ber bi

Dûmahîk: r. 9

# Liberxwedana bi qerardarî dijimin anî rê

Girtiyê dewa Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan (PPKK) M. Şêxmûs Cibran (Xalit) nuha jî ji ber parastinê wî yêndi mahkemêne de bi salan jê re ceza tê xwestin.

M. Şêxmûs Cibran ji sala 1986'an û vir de ye di mahkeme û di zîndanê kolonyalistan de bi mîrânî li ber xwe dide û serê xwe li hember zorê natewîne. Li gel hemû bê imkanî, serîn xerab û êrisen dijmin ên fizikî û cezayî, mafê xweparastina bi Kurdî di mahkemâne de diparêzê û ji bo bi dest xistina vî mafî têkoşînê dide. Di her mahkemêne de bi xurtî li hember îcbar-kirina axaftina bi Tirkî derdikeye û dibêje: bêyî zimanê diya xwe ez yek gotin jî nabêjim. Vê liberxwedanê bi mehan ajot û di dawiya dawî de mahkemîn kolonyalist mecbûr man daxwaza wî ya xwe parastina bi Kurdî qebûl kirin. Pişti ku wî ev maf, bi qerardariya xwe ji mahkemê stend, parastineke 14 rûpelî bi Kurdî hazir kir. Ew di dawiya vê parastina xwe de wiha dibêje:

"Wek min li jor jî da xuya kirin, get wextekê jî parastina nîjadperestiyê û dubendîtiyê neketiye bîra

me û ne jî em fikirî ne. Ji ber ku ev serê sedsalan e ku gelê Kurdistanê ji ber destê nîjadperestiyê û bindestiyê êşen ku nekişandîye nemaye (...) Rêexistina me PPKK li ser bingeha ramanê Marks û Lenîn ava bûye û ji roja avabûna me û vir de armanca me ev e: Di dêli Kurdistanek mêtîngeh, perçekirî û bindest de, Kurdistanek yekbûyi, serbixwe, azad û demokratik..."

Li alî din, li ser weşandinê çend nîvîsên wî di hin kovaran de hin daweyen nuh lê vekirin. Ci li ser van dawan be û çi jî li ser rewşa ku gava tê mahkemekirinê be, ew di nama xwe ya tarîxa 21.09.90' de wiha dibêje:

".... Him ji ber parastina min û him jî ji ber hin nîvîsên min ên ku di hin kovaran de hatibûn weşandin li min daweyen nuh vekirin. Ji xwe cergî ku ez ji Diyarbekirê hatime û vir de ye di hemû têkiliyên resmî de ez bi Tirkî naaxivim. ji bo vê yekê jî ev bû du car in ku ji min re tercurman tînin dadgehê. Lê belê kesen ku bikarîbin tercumaniyê bikin nînin. Ji ber vê yekê jî dadgeh ji



M. Şêxmûs Cibran

dadgehtiyê derdikeye, dikeye rewşek tiyatroyê. Gelek caran jî em bi dijwarî dikevin hev.

Di van rojêni dawî de daweyek nuh ji ber nîvîsa min a ku di kovara Halkin Gerçeğî de hatibûn weşandin vekirin. Wer bawer dikim ku we yê xwendibe. Ji bo vê dawê min parastina xwe bi Kurdî amede kir.

M. Şêxmûs Cibran

## Melê Camiyê li ser nimêjê hat kuştin



Mele İbrahim Döner

Dûre ji min re gotin ku birayê te intûxar kir. Mele İbrahim merivekî pêşverû û welaperwer bû û li herêma xwe ji ali gel ve pirr dihat hez kirin. Hêzên kolonyalist pişti bîryarên SS êdî hewce nabînin ku zulm û zor û cînayetên xwe veşerîn. Ew bi hawakî eşkere gundan wêran dikin, kesen teslimî wan nebîn ya surgûn dikin ya jî davêjin zîndanê. Û ku vanan jî qîm nekin, wek bûyera mele İbrahim raste rast gulle baran dikin.

## Ji bo ku di Kongrê de bi Kurdî axaftin

### Sê Kurd hatin girtin

Di Kongra (29. 10. 1990) Komela Mafêni Mirovî ya Tirkîye de ji bo ku Kurdî axaftin sê Kurd hatin girtin. Nûneren Komela Mafêni Mirovayî ya Diyarbekirê Vedat Aydin axaftina xwe ya Kongrê bi Kurdî kir û Abukat Ahmed Zekî Okçuoglu ji axaftinê wî wergerand Tirkî. Ji ber vê yekê her du jî ji ali polis ve hatin girtin. Çima ku li hember vê yekê derket Av. Mustafa Ozer jî bi wan re hat girtin. Li gor polis sedemîn girtina van her du kesan ew in ku Vedat Aydin bi zimanekî qedexkirî xeber daye û Abukat Ahmed Zekî Okçuoglu jî bi karê xwe yê wergerandina vê axaftinê, hissîn milî zeif kirîye.

Ev buyara han carek din bû delîlê durrîtiya berpirsiyâşrên rejîma Tirkîye. Ew li hundur û li dervayî welêt beyanan didin ku li Tirkîye herkes dikare bi zimanê xwe biaxive û tu tehdît li ser wan nîne. Lê polis û mahkemîn Tirkîan her roj bi buyerekê wan vi-rek derdixîne, durrîtiya wan eşkere dike.

Helbet Kurd êdî zêde guh nadîn van tehdîd û qedexekirinan, berebere di mahkemâne de û di civînen resmî de, daxwaza dilê xwe bi zimanê xwe yê şerîn yê zikmâkî diaxîvin. Hêvî ew e ku ev karê hêja û pîroz li her derê welêt û di her kar û barî de ji bal her Kurdî ve bê kirin.

## Civîneke Yekîtiya Nivîs

Di roja 28.10.1990' an de, bi amadekirina Yekîtiya Nivîskarêne Kurd li Swêdê, li ser "Edebîyata Kurdî li Derveyî Welat (Edebîyata bi Zaravê Kurmancî) seminerek "çebû. Li gor nameya ku Y. N. K. L. S. ji xelkê re şandibû, wê Mahmut Baksî, Mehmed Uzun, Rohat û Xelil Dihoki, li ser "edebîyata Kurmancî li derveyî welat" bipeyivîbûna. Name bi Kurmancîya tîpêni laînî û bi Soranîya tîpêni erebî hatibû nivîsandin, lê di beşa soranî de ne xuya bû ka mebest ji edebîyata Kurdî, "edebîyata bi zaravê Kurmancî" ye.

Kesên ku hatibûn guhdarîya semînerê, hêvî dikirin ku wê li ser edebîyata Kurmancî ya li derveyî welat -eger ci lêkolînê tekûz jî nebîn. - bi kêmânî melûmatine gişî bibîhîsin. Mehmed Uzun di destpêkê de da xuya kirin ku wê Mahmut Baksî li ser tecrubêni xwe nivîskarîyê, Xelil Di-hokî li ser edebîyata Kurdî ya ku li derveyî welat, ji alîyê "Kurdîn Iraq û Iranê ve tê afirandin", û Rohat jî wê li ser rewşa edebîyata Kurmancî li derveyî welat, bipeyive.

Wekî hinek guhdarêni din, ez jî welê têgihiştîm ku Mahmut Baksî wê li ser nivîskarîya xwe; ka kîjan nivîskaran tesîr lê kirine, dîtinîn wî li ser edebîyata Kurmancî ya li derveyî welat, ferqa edebîyata Kurmancî ya li derveyî welat, berî ku ew hatiye Swêdê û ya iro, konkret, berbiçav, Kurmancîya berî bîst şalan û ya niha (Mahmut Baksî berî bîst şalan ji welêt derketiye) û belkî jî çend gotin li ser "hebûna" edebîyata Kurmancî, (berî du salan Rojen Barnas di konferansekê de îddîa kiribû ku edebîyata Kurmancî tuneye) bike û li ser berhemên xwe bipeyive. Lê qala van nebû; Mahmut Baksî pêşiyê ji valabûna salonê gazindî kirin: "Divê em civînen xwe Şembî û Yekîtiya nekin, Kurd rojêni taşulan ji xwe re dihêlin. Divê em rojêni nav heftiyê, emê bêjîn Sêşemban civînen xwe bikin. Wê çaxê wê mamostayêne me herin ba rektoren (mudur) xwe, bîbêjîn civînek li ser zimanê Kurdî heye û izînê bistin. Karkeren me jî wê weha bikin û hûnê bîbînin, wê salon devre pir bîbin." Li ser tecrubêni xwe jî Mahmut Baksî gotinêni li jêr kirin: "Dema ku ez

hatim Swêdê, îmkanen pêşxistina ziman tunebûn, ji bo vê yekê min bi Swêdî nivîsî..." "Min bi Swêdî nivîsî, ji bona ku ez kultura Kurdan nîşa gelê Swêd bidim..." "Di sala 1977' an de Wezîrê Kulturê Swêdê ji min re got: "Tu çîma pirtûka xwe 'Ihsans Barn' nakî kurdî." Ez rabûm min bi navê 'Zarokê İhsan' kir Kurdî, lê zimanê Kurdî ji min zêdetir bû; min pirtûk ji Hemreş Reşo re şand ku li zimanê wê binêre. Hemreş devoka Adiyamanê xist tê de, min jî bi devoka Kerza nivîsandibû. Di kitêbê de her du devok ketine qirika hevdû û ez dibêjim heta niha jî şer dikin." "Divê zimanê me yê yekgirî hebe, devî hevalen Soran baş bizanîn ku tişîn wan çiqas baş jî bin, 15 milyon Kurmancînikarin bixwînin. Ez pir dixwazim helbesten Şerko Bêkes bixwînim, lê ez nikarim."

Xelil Dihokî di destpêkê axaftina xwe de daxwaza lêbûrînê kir ku "...Babet, babetekî pir giran e û lêkolînê kûr pêwîst in, lê wexta min tunebû ku ez xwe baş amade bikim." Ji gotinê Mehmed Uzun welê xuya bû ku wê Xelil Dihokî li ser "edebîyata ku li derveyî welat ji alîyê Kurdîn Iraq û Iranê ve tê afirandin" bipeyive. Lê Xelil Dihokî li ser vê yekê nepeyivî; bi gotinêni gişî, qala tevgera edebîyata kurdi ya li Kurdistana Iraqê kir û navê hinek şairên ku niha li wir dijîn, anî û bêyî ku sedeman rîz bike, li ser wan û berhemên wan gotinêni xwe dubare kirin. Tişîtê bala her kesî kişand ew bû ku Xelil Dihokî gelek caran li dû hev helsengandina xwe li ser edebîyata kurdi ya li Kurdistana Iraqê bi gotinêni pêwîstî lêkolînan in, lê bêyî ku bi gotinekê ji çeli bihayê edebî yê berheman bike, dugisîn kir: "Bi rastî jî li Kurdistana Iraqê şir pêşketî ye, bi rastî jî Hüsen Arif çiroknivîseki hêja ye." Lê çîma, li ser ci esasi, guhdar hîn jî mereq dîkin.

Rohat wê li ser rewşa edebîyata Kurmancî, li derveyî welat, bipeyivîba. Lê bi gazindîn nebûna reklama pirtûkîn nivîskarêne kurdi, ji pêwîstîya konferansseke gişî, ya tev nivîskarêne kurdi ên li Ewrûpayê dest pê kir û bi nebûna wexta nivîskarêne Kurd, nebûna îmkanen malî, gotinêni xwe berdewam kirin. Ne kurtediroka edebî-

# arên Kurd û Ciddîyet

yata Kurmancî li derveyî welat, ne nav û hejmara berhemên edebî yêni li derveyî welat, ne bihayê wan ê edebî û ne li ser hebûn, yan nebûna edebiyata Kurmancî û ne ji li ser qonaxênu ku zaravê Kurmancî li derveyî welat tê re derbas bûye, yek gotin ji negot.

Paşê Mehmed Uzun ji her yekî pîrsiyarek kir û pişti gotinêwan civîn bi dawî hat. Çend guhdaran li ser semînerê û gotinênu ku hatine kirin, dîtinênu xwe gotin. Li vir tev guhdarênu ku peyivîn, qala mustewayê nizim yê semînerê û nebûna tehlîl û lêkolînên ilmî kirin. Li ser gazîndan, Mehmed Uzun "bersiv" da ku: "Ev ne semîner e, lê panel e, debat e." Bê guman weke tev guhdaran Mehmed Uzun ji dizanibûku xelk li ser ferqa "panel" û "semîneran" napeyive û şertek tuneye ku di panelen de qala lêkolînên ilmî nayê kirin û xuya ye haya Mehmed Uzun jê tunebûku nameya li ser navê Yekîtiya Nivîskarênu Kurd li Swêdê, ji bo vê civînê hatibû nivîsandin, xelk ji bo "semînerek li ser edebiyata Kurmancî li derveyî welat" hatibûn gazi kirin, ne ji bo "panel", yan "debat" ê.

Di dawîya civînê de guhdarekîji Mahmut Baksî pîrsiyar ku Mahmut Baksî gotiye "yekem berhemê tiyatroya Kurdî min nivîsandiye" yan na. Li ser pîrsê Mahmut Baksî ne bi gotin, lê bi meneya "na", serê xwe hejand. Xwediye pîrsê pîrsa xwe dubare kir, lê bersiva Mahmut Baksî her wek berê, bê gotin, bi meneya "na" serê xwe hejandin bû, teví ku li gor gotina gelek Kurdan û bi taybetî ji Kurdên Îraqê, Mahmut Baksî li ser pîyesâ xwe "Kulîlkîn Newrozê" di sala 1984'an de, di hinek rojnamê swêdî de nivîsiye ku ev pîyesâ min, yekem berhemê tiyatroya Kurdî ye.

Berî ku guhdar hemû pîrsên xwe bikin, dema kiriya salonê bi dawî hat - ji bo babetekî weha, salon ji bo 3 sa'etan hatibû kirê kirin - û guhdar wekî ku pîwest, besdari 'panelê' ji nebûn û bê guman kesê ji nezanî çima navê Mehmed Uzun di namê de hebû û ew nepeyivî.

Tiştê divê bê gotin ev e ku semîner be, yan panel, civîna Yekîtiya Nivîskarênu Kurd li Swêdê, ji xuyakirina rewşa edebiyata kurmancî li derveyî welat, pir dûr bû û ez bawer nakim kesek bi malûmaten li ser babetê, yan nû, ji salonê derket.

Kesek ji nivîskarênu Kurd naxwaze ku berhemên di sewîya klasikên cihani, yan di sewîya berhemên navdar ên iro de berhemên edebî pêşkêş bikin. Lê mafê mirov heye ku mirov ji wan di karê xwe de tekûzî, ciddîyetê bixwaze. Ne veşartî ye ku Rojen Barnas di 15.10.1989' an de, dema di "Konferans a Stokholmê" de\* li ser rewşa edebiyata Kurmancî li derveyî welat peyivî, got ku "edebiyata Kurmancî tuneye, lê nivîsara Kurmancî heye". Û nebûna edebiyata Kurmancî ji bi "çewtîyên ziman" ve girêda. Rojen Barnas, nivîsara kir sê bes: Nivîsara rast, nivîsara baş, nivîsara bedew. Û bi ya wî tiştê bi Kurmancî hatine nivîsandin, ji aliye gramer ve ne rast in û lewra

jî nabin 'edebîyar', lê dibin nivîsar. Ji wê rojê ta iro nêzî du salan derbas bûn; ne Rojen Barnas, ji bona îsbatkirina 'nebûna' edebiyata Kurmancî û ne nivîskarekî din ji îsbatkirina 'hebûna' edebiyata Kurmancî, tiştê negotin, nenivîsin.

Herkes dizane ku Mahmut Baksi beşike pirtûka xwe ya bi Trkî "Kürt Tarihi - Kisaca - Bi Kurtî Dîroka Kurd. Ciriya Pêşin, 1972) ji pirtûka Dr. Şivan girtiye û bêyi ku navê wî bide, pirtûk bi navê xwe çap kiriye. Mehmet Uzun, ji kovara Hawar hinek rûpelên wekî ku li wir hatiye nivîsin, xistiye romana xwe "Tu", bêyi ku nav bide. Dîsan Mehmet Uzun di nivîsa xwe de (Kurdistan Press. Hej.83 - 9-10) li ser rexne û rexnegirîyê dibêje: "Li her derî rexnegir, danasîn, rexne û dîtinênu xwe li ser sê pîrsan ava dike; kî, çima, çawa? Ï rexnegir, dîsan li her derî bi erîni (pozitif. N.) dikeve pey pîrsan û bi erîni li esera edebî dinêre." Li gor vê baweriya xwe Mehmet Uzun di sohbetekî xwe de li ser rexneyen ku di Kurdistan Pressê de di derheqâ hinek romanen Kurmancî de çap bûne, got: "Keko ez dizanim kes li dostê xwe tiştê negatîf nivîse. Ez ji heval û dostê nivîskara dixwazim ku li ser berhemên wan binivîsin. Meselen Ahmet Çantekîn dostê Şahîn Soreklî ye, min jê xwest tiştîki li ser wî binivîse, wî jî nivîsi."

Fırat Cewerî di hejmar 83. 9-10 a Kurdistan Pressê de dibêje: "Ev nêzîki deh salan e ku xebata min li ser çirokan heye. Ez dixwazim vê xebata xwe hîn kûrtîr bikim û li ser esasê çiroka nûjen, di çiroknîvîsandina kurdi de riyekekî vekim." Deh sal ji bo nivîskarekî ne kêm e. Divê F. Cewerî, eger hebe, qe nebe encama xebata 10 salan pêşkêş bike. Bi kêmânî kesen ji nû dinivîsin, sûdekkî jê bigrin. Bê guman nivîskarênu Kurd ji divê bi karê ku nivîskarî û her weha nivîskarıya Kurmancî dixwaze-rabibin. Divê di kar û gotinê xwe de ciddîstir bin. Dema li ser tiştîkî dipeyivîn, bikarin bi delîlan gotinê xwe îsbat bikin, yan dema bixwazin li ser tiştîkî semîneran bidin, divê berî hingî lêkolînan bikin û bi hazîrî bê. Erê bazara Kurmancî kêm e, xwendevanen edebîyata Kurmancî kêm in û heqê nivîskaran heye ku ji nefirotina kitêbên xwe gazîndan bikin. Lê divê li ser vê yekê ji bîfikirin: "Erê tiştê ku ez dinivîsim, hêjayî kirînê ye". Yan ne ev gotina pêşîya wê her tim di bîra me de be:

"Ji yê ereb pîrsin: 'Çima qûna te reş e?'  
Got: 'Ez ci bikim, malê min ev e.'

Ev tehlîla ku li ser mustewayê nivîsarê hatiye kirin, tehlîla zimannasekî tirk, Ömer Asum Aksoy e û di pirtûka wî "Dil Yanlışları - Türk Dil Kurumu. 1980" (Çewtîyên Ziman - Muesesa Zimanê Tirkî. 1980) de hatiye çapkirin.

S. Rêving

**NEYNIK** | **Mehmed Uzun**

## GUHERÎNÊ CİHANÊ Ú KURD

Berî niha bi çendekê şairê Ereb Adonis hatibû Swêdê. Kitêba wî "Aghani Mihyar ad-Dimashqi" bi swêdî derketibû û Adonis ku ji Sûriyê ye, li Lubnanê demeke dirêj jiyaye û niha li sirgûnê, li Parisê diji, bi hinceta weşîna kitêba xwe hatibû Swêdê. Şevezekê ez, Adonis, nivîskarê Tirk Demir Özlu û şairê Kurd Şérko Békes li restoranekî li hev civîyan û li ser hal û hewâle cihanê û Rojhelata Navîn hinekî peyivîn. Tiştîn ku ji wê sohbata xweş û germ derdiketin, ev bûn;

- Cihan ji binî ve diguhere. Rûpeleke tarîxê tê girtin, rûpeleke nû vedibe. Ew blok û sistemên ku heta niha cihan di navbera xwe de parve kiribûn, hêdî hêdî têk diherin. Hîmîn peyman û lihevhatînên mîna Sykes-Picot, Lozan, Molotov-Ribbentrop, Yalta, Tehran, Potsdam hildiweşin û rî li peymanen nû vedibin.

- Di vê guherîna mezin de mîjî, bîr û bawerî, nêrîn û pîvan ji diguherin. Nêrîn û pîvanen ku me heta niha pê tevgerên xwe bi rî dixistin, diguherin. Ter-mîn wekî pêşverûtu, paşverûtu, merivahî, demokrasî, hevalî û biratî, enternasyonalizm û h.w.d. şekil û naverokê diguherin.

- Ev guherîna gerdûnî dê-bivê, nevî-tesîrî li navçeyen ku em, Kurd, Ereb, Tirk, Faris, Cihû tê de dijîn bike û rewşa iroyîn ya navçê hêdî hêdî biguhere. Lî belê, ev guherînen ku dê li Rojhelata Navîn biqywimin, mîna guherînen Rojhelata Ewrûpayê nebin. Di guherînen Rojhelata Ewrûpayê de, ji Romanyayê pê ve, li tu dere xwîn nerîjî û ev guherîn bi şewyeke demokratik hatin pê. Lî, li Rojheleta Navîn ku warê neçarî, paştemayin, anti-demokratizm, bêgavî û zordar û diktatorîn biçûk e, dê xwîn birije. Ji ber sedemîn tarîxi, dîni, siyâsî cîvakî, guherînen Rojhelata Navîn dê bi xwîn be û mîna hêlekanekî wê hemû navçê bihejîne.

- Meriv divê ji bo van guherînan hazir be da ku çaxa pêla guherînan rabû, meriv di binî de nefetise û li ber pêlê nere. Berî herkesi ji Kurdên bêdewlet, bêquwet û jihevketî divê hazir bin.

"Kurd divê hazir bin..." Lî çawân? Bi ci awayî? Ci divê? Meriv divê ci bike?..

Du roj bi dû wê şeva xweş re, serê min bi wê sohbata bi sûd û bi pîrsen jorîn tîjî, ez çûm konferanseke navneteweyî[21-23-09.90] ku PEN-kluba Swêdê amade kiribû. Gelek nivîskar û ronakbir, Swêdî, Danmarkî, Finî, Amerika-Latînî, Afrîkayî, Rus, Çinî, Poloni, Letoni, Ermén, Ereb, Faris û Kurd, li

avakirina pêşerojeke çêtir û ewletir li tarixa xwe vedigerin.

Li xwe û tarixa xwe vegerin ji ber gelek sedeman pêwest e. Sistem û blokên ku frô hene û cihanê di nav xwe de parve kirine, li ser neheqîyan, li ser xwîna gelek netewe û gelî, li ser perçekirina gelek welatan ava bûne. Dengê gelek gelî hatiye birîn, bi darê zorê perda nizmahî, tirs, bêdengî û bêxîretiyê li ser gelek neteweşî hatiye rakişandin. Tarixa gelek gelî hatiye guhertin, gelek gel û netewe ji tarixa cihanê hatine derxistin û avêtin. Ew peyman û lihevhatînên ku di navbera serdestan de hatine pê, şekil û dûzaneke nû dabû cihanê. Lî li ser neheqîyan pir û pir mezin. Tarîx bi neheqîyan tîjî ye. Neheqîyan tarîxî tê pê û diqewimin. Lî ev neheqî tu carî ji bîr nabin û heta ev neheqî rast nebin, birîn nekewin merivahî, tarîx û wext her û her bi birîn e, bi kul e.

Şair û nivîskarê meksîkî Octavio Paz di berhema xwe "Le Labyrinthe de la solitude" (Xacriya Tenetiye) de dibêje ku ziman, gel û neteweşîn bindest her gav di kêleka tarîxê de jiyane. Welat û dewleten mezin û serdest rî nedane ku ev ziman, gel û neteweşîn bindest roleke navendî di avakirina tarîxa pêşerojê de bilizîn. Rola navendî ya welat û dewleten mezin û serdest bûye.

Lî iro, guherînen cihanê rî dide ku ev ziman, gel û neteweşîn bindest roleke navendî di avakirina tarîxa pêşerojê de bilizîn. Di tarîxa merivahî de, heye ku ev cara yekemîn e ku ev gel evçend nêzîkahî li fersend û imkanen guherîna qedera xwe dikan. Li gora gelek pispor û zaneyan, dinya iroj ber bi desentralizasyoneke bingehîn dije ku neheqîyan tarîxî ji holê radike û ewlehiyeke metîn ji bo mafên gelên bindest û biçûk tîne pê û rî dide ku ev gel û netewe bikaribe, bi rastî, «Danezana Gerdûnî ya Mafîn Merivan» di jiyana xwe ya civakî û siyâsî de bi cih bîne. Nemaze benden 2. û 21. ku li ser mafên serbestiya kesan û nete-weyan in.

Gelo Kurd di vî warî de li ku ne? Ew di kijan konaxê de ne û ci dikan?

Rewşa Kurdan li ber çavan e, jê re gotinê dirêj navê. Rewşa Kurdan ne tu rewş e, Kurd di her warî de ji hev ketine û nikarin xebat, gotin û daxwazên xwe yên curbecur bikin yet. Ez ne bawer im ku ji vê rastiya tahl re misal hewce be. Di rewşekê weha de, tîrsa min[û tîrsa gelek kesen din] ew e ku Kurd dîsan ji pêşketin û guherînen gerdûnî bêpar bimîn û gava pêla guherînan li navçeyê rabe, ew li ber lingan biçin. Eynî mîna heyema Şerî Yekemîn ye Cihanê. Hingê ji cihan bi lez guherî. Lî ji ber perçebûna pîralî, Kurd nikaribû bigîhistina mafên xwe. Dewsa ku em bigîhîn mafên xwe, Kurdistan bû goris-tan, bi qasî nîv milyonî Kurd hatin kuştin û pişta welêt şikest, ew bû çar perçe.

Bi hêviya ku tarîx dubare nebe, min dil heye vê nivîsarê bi du rîzên Adonis biqedînim;

"Ji sevîn avis re  
ez weletekî diafîrînim ji  
xweliya tarîxe."

## RAMANÊN RAMANWERAN

## Kesê bê ïdeolojî wek kaptanê bê pûsula ye

Zinarê Xamo

Yek ji gotinênu ku heri pirr têni bi kar anîn, gotina "ïdeolojîyê" ye. Ew geleç caran dibe mijara munqaşan û ji ali "rast" û "çep" ve tê rexnekirin. Bi taybeti ji pişti belavbûna "Sistema Sosyalist" û teslimbûna Welatê Ewrûpa Rojhîlat ji kapitalizmê re munqaşeyen li ser ïdeolojîyê ji kesiftir bûn. Lî li alî din car car ew, ji ma'na xwe ya esasi tê bi dûr xistin û di hin ma'neyen çewt de tê bi kar anîn.

Bi ma'neya heri nas û belavbûyi, ïdeoloji, teoriya di derheqê civatê de ye, yanî tevahiya fikir û dîtinênu ku dixwaze civat çava be... Gotina ïdeolojîyê di ferhengan de wiha tarif dibe: "ïdeoloji, sistema di derbareyê dîtin û fîkrîn siyasi, huqûqi, exlaqî, estetîki, dîni, felsefî..." "ïdeoloji dikare ilmî ya ji ne ilmî be, yanî dikare refleksa realita rast ya ji ya çewt be."<sup>1</sup>

"ïdeoloji, tevayıya bawerî, fîkrîn siyasi û sosyal ên mexsûsi civat ya ji sîfekî."<sup>2</sup>

Ji bo ku hîn baştir ronî bibe, em bala xwe bidin numûneyeke din ji: "Hemû şîklîn ïdeolojîk çawa ku ne ilim, senet, felsefe ya ji huqûq in, her wisa nikarin wezîfa wan ji bibînin. Lî ilim ji, felsefe ji, huqûq ji ji şîkilgirtina ïdeolojîk peyda dîbin û dikarin wek wezîfa ïdeolojîyê bibînin."<sup>3</sup>

Wek meriv di van numûneyen jorîn de ji dibîne, di navbera dîn, siyaset, felsefe, huqûq û ïdeolojîyê de têkiliyên xurt hene. Car din li gor ku di ferhengan de hatiye tarîskirin, meriv dibîne, ku her civat ya ji şexs pirr-hindik xwediyê "ïdeolojîyakê" ye û li gor "ïdeolojîyakê" dînyayê mutaale dike. Em dizanin însan bi tena serê xwe najî; di dewrekê de, li welateki, di nav civatekê de dijî; mensûbî sinifikî, tebeqâkê û ferdî aîlekê ye û karekî dike. Axir bi hawakî jiyana xwe ya sosyal didomîne. Bi kurtayî ev şertîn maddî yên heyatê şîklekî dide şexsiyeta însan û kêm zêde însan dike xwediyê ïdeolojîyakê.

Li alî din, em dizanin ïdeoloji ji wek muesseîn din (dîn, huqûq, exlaq) perçeyek struktura ser a civatê ye û di dawiya dawî de têkiliyên ekonomik eks dike. Ji ber vê yekê ji di civatekê sinif de her ïdeolojî muheeq qwediyê qerekereke sinifî ye û her mucadela ïdeolojîk ji muheeq teqabûlî muca-dela sinifî dike.

## Qutya Pandora

Li gel ku rastî ev e, lê cardin ji berdevkîn burjû-

wazî tim dixwazin ïdeolojîyê ji siyasetê, ji huqûq, ji exlaq û ji dîn biqetîmin, ya ji têkiliyên di navbera wan de bincil bikin. Bê şik hêzên sermiyandar û serdest vê yekê ji ehmeqîya xwe nakin, menefeta wan a sinifi wiha dixwaze loma. Ji ber vê yekê ji ew, her tim ïdeolojîyê bi tiştîn "ne bas" iîtham dîkin; wê, wek Qutya Pandora, çavkaniya hemû xerabî û nebaşîyên rûyê dînyayê nîşan didin. Armanca wan ewe ku hêzên karkir û gelên bindest ji siyasetê dûr bîmîn. Lema ji generalen faşîst pişti derba 12'ê ilonê her gava ku devêne xwe vedikirin êrisi siyaset û ïdeolojîyê dikirin, digotin: Yêni Tirkîye anîne vê rewşê "ïdeolojîyên xerib" in, divê ji iro pê ve em nehîlin xorîn me bi van ïdeolojîyan jahrdadayî bibin û hwd.

Em dizanin ïdarekirina civateke polîsîze nebûyi ji ïdarekirina civateke polîsîze bûyi, gelekî rehettir e. Ji ber vê yekê wan, hemû rîxistin û muesseîn siyasi, demokratîk û meslekî girtin û bi hin fermanan mijûlbûna karêni siyasi li wan yasax kirin.

## Durrûti

Li alîkî burjuwazî naxwaze gel, sinif û tebeqeyen kedkar bi ïdeolojîya "xwe", xwe rapêçin û bi karêni siyasi rabin, lî li alî din ew bi xwe ïdeolojîyekê diparêzin; him ji ïdeolojîke ku "resmî" ye, serdest e. Çimkî ïdeoloji berhemekê civatê sinifi ye, bi peydebûna sinifan re peyda bûye. Lewma ji di dawiya dawî de menfeetîn ekonomik û siyasi yêni sinif û tebegân tîne zîmîn. Lî belê burjuwazî, hêzên serdest vê rastiyê eşkere nabêjin, ji bo bincikirina vê rastiyê gelek fîlbaziyan dîkin, bi gelek dek û dolaban gel dixapîn. Lî tarîxê nîşan daye ku ev xapandin ji ne ebedî ye, zû ya dereng rojekê gel hişyar dibe û hegemonya ïdeolojîya burjuwazî dişkîne û doza masfîn xwe yêni siyasi, demokratîk û ekonomik dike. Hêzên serdest heta "nuxtakê" li hember van daxwazan tehamulê nîşan didin, lî gava ku daxwaz wê "nuxtâ" derbas bikin, tavilê dest davêjin sîlehek û li hember gel zorê bi karîn, xwinê dirjin. 12'ê ilonê di vî warî de numûneyeke balkêş e. Em baş dizanin yêni hatin kuştin û di zîndanan de hatin rizandin-ku iro ji ev çerx hîn bi vî hawî digere- ne kesen ku ïdeolojîya burjuwazî diparastin, lî hêzên pêşverû û şoreşer bûn. Çimkî me wek Kamûran Înan û Fey-

zîoglu piştevaniya dûzana mewcûd nedikir, me cîhanek bê zulm, bê kedxurî, wekhevî, azadî û demokrasi dixwest. Me dixwest em welatê xwe rizgar û gelê xwe ji azad bikin. Li hember vê, hêzên kolonyalîst û hevalbendênu wan ji me re digotin "dev ji xebata guherandina dûzanê berdin, ev dînya wiha hatiye wê wiha here." Em ji li dijî vê felsefî derketin û me got na, dînya wiha nehatiye û wê wiha ji nere. Ev her du dîtin; du ïdeoloji, du felsefî cihê ne, em ji wan, ya dawiyê diparêzin.

Pişti ku rastî ev e, em bixwazin nexwazin di neticê de her ïdeoloji rengeki siyasi digre û hedefen siyasi dide ber xwe û heta ku li ruyê dînyayê her rengê kedxuriyê, zulm û zora mili, sinifi û cinsî hebe wê siyaset ji hebe û ïdeoloji ji...

## Ma Dijminê ïdeolojîyê Burjuwazî Tenê ye?

Heta vira em li ser pozisyonâ hêzên kedxur a li hember ïdeolojîyê sekînîn, ku ew bi zanîn û ji ber menfeetîn xwe yêni sinifi, dixwazin ïdeolojîyê û siyasetê li ber çavên sinif û gelên bindest reş bikin, pîs nîşan bidin. Ev aliyeke gelşê ye, aliyeke din ji heye ku car car, bi taybeti ji di demen têkçûna têkoşîna şoreşer de, di demen zêde-bûna terora paşverû û fasît de, ji nav hêzên şoreşer û pêşverû ji hin kes li hember ïdeolojîyê dengen xwe bilind dîkin, dibêjin" ji me re ïdeoloji ne lazim e." Niyet çiqasî paqî dibe bira bibe, ev dîtin ji feydeyê zedetir zirarî dide têkoşîn û xebata hêzên pêş-verû û şoreşer, Di vî warî de numûna heri nêz nîşâ N. Kirîv e.

Di hejmara Berbangê ya 65'an de nîşâ N. Kirîv hat veşandin. N. Kirîv di nîşâ xwe de gotiye, "me tu ïdeolojî navê, ji ber ku me armancek pîroz heye." N. Kirîv, dîtin xwe ya li ser "ïdeolojîyê" baş eşkere nekiriye. Lî bi qasî ku ji tiştîn wî gotine tê fahmîkirin ew, parastina ïdeolojîyekê ji bo Kurdeki şoreşer, pêşverû rast nabîne; lema ji dixwaze ku Kurd "bê ïdeolji" bin.

## Dev ji Şîr Sewitiyê Pîfi Dew Dike

Di gotina N. Kirîv de du nuxtîn girîng hene ku divê bînî ronî kirin. Yek jê, gelo mumkûn e ku însan pirr ya ji hindik ne di bin tesîra ïdeolojîyekê de be û ïdeolojîyekê neparêze? Dudu, ïdeolojîyê çawa rê li ber Kurdish girtiye ku nahêle ew bigîhîjin "armanca xwe

ya pîroz?"

Bersîva pirsa pêşî di destpêka nîvîsî de bi çend numûnan hat dayîn. Ku di wan numûnan de ji me dît însan bê "ïdeoloji" nabe, li gor rewşa xwe ya maddî ya jiyanê her kes xwediyê ïdeolojîyekê ye. Lema ji Marks gotiye, "yê di holikeyê de dijî wek yê di gesrekê de dijî nafikire."<sup>4</sup>

Her sinif, her tebeqe li gor menfeetîn xwe yêni civakî, siyasi, aborî û hwd. dixwaze civatê biguhere- ya ji bê guherandin- û ji bo gîhiştina vê armanca ji bo gelek warên civakê de, bi gelek şikil û riyan têkoşînê dide. Ev têkoşîn di warê ekonomik, siyasi û kulturel de li gor ïdeolojîyekê dibe. Meselen Ozal, Vehbî Koç, Sabancî, Kenan Evren, yanî hêzên kolonyalîst ïdeolojîya resmî, Kemalîzmê diparêzin, ew û şoreşer û pêşverû yêni. Kurd cihanek wek hev naxwazin; ew dixwazin welatê me heta û hetayê mustemleka wan be; em ji dixwazin rojek berî rojekê ji bin nîrê wan rizgar bikin. Di vê nuxtê de siyaset tê meydanê. Ew li gor ïdeolojîya xwe- ku ïdeoliya wan a burjuwazî ye, a kolonyalistan e, pas- verû ye- û em ji li gor ïdeolojîya xwe- ku ïdeoliya me heqî û rastiyê temsîl dike, pêşverû ye- bi siyasetê mijûl dîbin û siyasetekê dimeşînîn. Ü em dizanin siyasetek bê ïdeoloji ji ne mumkûn e.

Em werin ser nuxtâ duduyan, yanî "ïdeoloji nahêle em bigîhîjin armanca xwe" Bê şik ev dîtinék subjektif e û ne ilmî ye. Ü rastî ji, eksî vê dîtinê ye. Carê berî her tiştî, ew "armanca" ku N. Kirîv bi xwe qal dike, bi saya ïdeolojîyekê ji xwediyê wan gotinan re bûye "armancek pîroz". Ger ne ïdeoloji bûye "armanceke" N. Kirîv ji tunebû.

Lî wer xuya ye ku wek gelekan, devê N. Kirîv ji ji "şîr şewitiye, içar pîfi dew dike." Bê guman pîskirina dew ne tedbîreke rast e; tedbîra rast ewe ku meriv şîr bi "germî" venexwe, ku meriv vexwar, helbet wê devê meriv biperite.

## Ya Çewt Dogmatizm Bû

Ez N. Kirîv baş fahmî dikim, ez dizanîm dema ew dibêje "ji me re ïdeolojî navê", bi rewşa me ya iro dilê wî dişewite, ji tarixa me ya nêz, ji gelek serpihatiyê xwe yêni tîrajîkomik û ji bêtifaqî û perçepçetiyâ me ya bê mane hereket dike. Hesasiyeta ku ew nîşan dide ji binde ne bê

Dûmahîk: r. 11

## Lawikê Berrîvanî

## Kî ne Realist e?

Entelektuelekî Ewrûpî, dostekî Kurdan ji bo ku zahmetî û nerealistiya daxwaza Kurdistanek serbixwe bi numûneyeke "basit" û "balkêş" têxe serê Kurdeki serhişk, gotibû:

- Daxwaza Kurdistanek serbixwe ne daxwazeke realist e. Divê hûn baş bizanibin kes piştigirtiya daxwazek wiha nake. Heta hin bûyerên pirr mezin çenebin, kes naxwaze xerîta dînyayê ji nuh ve bê guherandin. Avabûna Kurdistanek serbixwe bes ji bo hazirkirina xerîteyên nuh wê ji dînyayê re bi mil-yonan bibe mal; divê her dewlet ji xwe re xerîteyên nuh hazir bike. Hema ev numûne ji nişan dide ku daxwaza Kurdistanek serbixwe çiqasî zahmet e.

Yê Kurd bersîvek çawa dabû dostê me yê Ewrûpî ez nizanim, lê iro gava meriv xerîten dînyê yêni siyasi dide ber hev, meriv dibîne ku qet hev du nagrin. Yêni ku karibûne biguhérîn, guherandine û kes ji ranebûye negotiye, "ev ne guherandineke "realist" e, ya ji wê ev guherandin ji dînyayê re bi "milyonan" bibe mal. A muhîm meriv kanibe bike. Pişti ku meriv kanibe, li dunyayê tu daxwaza ne realist, tu guherandina ne realist tuneye!

Ma pişti Şerî Cihanê yê Duyem gava hêzên emperyalist Kurdistan perçê kirin û "bi gopalê xwe" sînorênuh kişandin, qey ev guherandinek, kirinek "realist" bû?

Ya ji gava Çorçîl, Roosevelt û Stalin li Yaltayê,

Ewrûpâ wek serêk penerê terr dîlim dîlimî kirin û li hev par kirin û bi vî hawî ji xerîta dînyayê ya siyasi ji nuh ve çekirin, kî dikaribû bigota hûn bi van kirinê xwe "ne realist" in?

Gotinek pêşîye heyen, dibêje: "Zêr zane, zor zane, devê tivinga mor zane." Wê rojê zêr ji, zor ji û devê tivinga mor ji li ba wan bû. Ü wan ji li gor dilê xwe dînyâ li hev par kirin.

Heta payîza 1989'an ew gelên ku bi darê zorê, bêyî irada xwe perçê bûn, qet bawer nedikirin ku rojekê ewê ji karibin xerîta dînyayê ji nuh ve biguhérîn.

Roja ku DDR bi riza dilê xwe, xwe fesh kir, rojnamevanekî ji xortekî Alman pîrsî, got "te dîtina rojekê wiha bawer dikir?" Xort got:

- Me qet nedixwest ku em dewleta DDR hilweşînîn. Me dixwest em di nav çerçewa dewletê de wê biguhérîn û riyeke sisîyan bibînin. Lî tiştîkî din qewîmî ku qet di hesêb de tunebû.

Dînyâ wiha ye, carna meriv hesab dike, hesabê meriv hevdu nagre û carna ji meriv qet tiştîkî wer napê, hesabekî wer nake, kabê meriv mîr tê û meriv bi ser dikeve.

Kurd ji sedsalan ve ye ku hesab û kitaban dîkin ji bo ku li mintiqê coxrafya siyasi biguhérîn, lê hesabê wan û yêni xwediyê dînyayê li hev dernakeve. Almanan, gelên Baltîkî hesabekî ê-reftî kirin, lê ji "qeza qudratî" re hesabê wan rast derket. Rast derket, çimkî hesabê wan li gor hesabê xwediyê dînyayê bû. Lema ji xwediyê dînyayê careke din hatin ba hev û şîklikî nuh dan xerîta dînyayê ya siyasi. Ü pişti vê guherandin, min qet nedît ku dewletekî got; "wele ev guherandina di xerîta siyî ya dînyayê de "ne realist" e", çimkî wê ji dînyayê re bi milyonan bibe mal" Lî çaxa Kurd têne rojekê, wê gavê mesela "nerealistîye" tê meydanê.

Wê gavê, mesele ne "realistî" û "nerealistî", ne heq, huqûq, edalet, neheqî û heqî ye. Mesele lêhatin e, qewet e, zor e. Heger em karibin van her sê faktoran bigîhînin hev, realistî dînyayê yê heri mezin em in...

## Rast kirin

O Di hejmara me ya berê di rûpela lêde (Ajanêne Iranê keça Qazi Mihemed Affet Qazi kuştîn) ew gotinênu ku li ser navê İbrahim Çorapçi hatine nîşandin, ne yêni wî ne, ew gotinênu Husêne Kurdiyad in. Bi çewti li ser navê İ. Çorapçi hatine nîşandin. Ü rojnamânu ku jê hatiye girtin ji ne "Dagens Nyheter" e, "Aftonbladet" e.

O Sernîvisa Lawikê Berrîvanî çewt hatiye nîşandin, rastîya wê, "Xwedîkirina Zarokan" bû.

O Di qunciqê "Hindik - Rindik" de, fiqra bi sernîvisa "Sonda xwe bi cî anî" û ya bi navê "Sûretê bizina wî tê ber çava" her du ji bi çewti carek din hatine çap kirin. Ü divê em bibêjin, ev dubarekirin ne ji ber ku türkî Zînarê Xamo vala bûye, lê sedi- sed ji ber çewtiyên beşeri ye.

Em van her sê çewtiyê xwe rast dîkin û ji nîşkar û xwendevanê xwe lêborîn dixwazin.

## Lêkolîn

**S**erihildana belengazên Kurd ya ku di 1917'an de li Şîrvanê destpêkiribû, di tebaxa 1920'an de gîhaştibû qonaxa xwe ya herî bilind. Serokê serihildanê Xudaverdî (Xudo-Xan) şivan bû, serokê eşîra Kurd a Zaferanlu Xan Tac Muhamed İbrahim bû (İvanov, M. S. Noveyseya İstorîya İranâ. M., 1965, r. 27). Serihildeyan dezgeya derebegitîyê hilweşandin, erdên wan ji desten wan stendin, doza rakirina bacen feodalî yên ku ji aliyê Ingilizan ve dihate ferzkirin, kirin, peywendiyyê dostayı bi Rûsyâ Sovyeti re danîn (İvanova, M. N. Natsionalino-ovsoboditel-novo dvijenie v İrane. M., 1961, r. 128).

Reaksiyona Hikumeta İranê li hember vê tevgerê bû fermana Xanê Borcnurdê Serdar Muazez ê ku dixwest temamiya herêma Şîrvanê bi darê zorê isleh bike. Mufrezeyen çekdar yên bi rîk û pêk yên Muazez bi mufrezeyen Xudo-Xan û aligirêne wî Timur Xan re di Çileya Paşîn a 1917'an de ketin şer. Di şerekî weha de Xudo hat birîndarkirin, lê wî xwe veşart, Timur Xan jî reviya (Ataev X. Natsionalino-ovsoboditelinoe dvijenie v Xorâsanê v 20-x godax XX. v. Aş., 1962, r. 26).

Karbidesten İranê li hember serihildeyan beşen leşkerî yên ku bi alikariya Ingilizan ve hatibûn baş amadekirin, mobîlize kirin. Lî ji aliyê din, qismekî ji leşkeran yên ku li gel hikûmetê şer dikirin, di dema şer de, bûbûn aligirêne serihildeyan.

Ji bo vemirandina serihildanê, Ingilizan di bin hukmê karbidesten İranê de mufrezeyen ku ji Hindîyan hatibûn amadekirin, hiştin. Dengê Kurdan di wextê xwe de birin. Lî, Xudo Xan fikra ji nû va rakirina serihildanê dîsa belav kir. Di cî de, bi aligirêne xwe ve di Hezîrena 1920'an de mufrezeyen leşkerî amade kir û bi wan ra dest bi şerê li hember Xanê herêmê û leşkeren Ingilizân dagirker ku li Xorasanê bûn, kir. Tevger, di cî de berfireh bû û li temamiya mintiqê Kuçan û Borcnurdê belav bû. Di vê serihildanê de, gundiyyê ji gundêne Xiristîyanan, belengazên bajêr û serokeşîren berên piçûk bi mufrezeyen xwe va tê de cî girtin.

Karbidesten Tehranê hêzek pirr mezin ji leşker û cendirmen şandin Kuçanê. Tenê ji Babacikê (gundekî İranê li nêzikî sînorê Sovyet'e) sed cendirme hatin şandin Kuçanê, lê di nav wan de hejmarêne leşkeren ku sempatiya wan ji serihildeyan re hebûn, nekêm bûn. Leşkeren ku hatibûn şandin ji bo ku şerê Xudo bikin, "hêzeke mezin ketin refen

serihildeyan" (Nabat revolyûtsii. Taşkent, 25. 07. 1920). Serihildeyan Kuçanê (4), navçeya mezin ya Xorasanê, tehdît dikirin. Bê ku dereng bimînin Kela Gîlenê ya ku nêzikî Şîrvanê bû bi dest xistin û ew der kîrin merkeza serihildanê.

Hikûmeta İranê di bin quman-dariya Waliyê Serdar Nusret Teymurî de 600 kes şande wir, ku ji alî leşkerî ve ji Ingilizan alikari digirtin.

Di Tebaxa 1920'an de li herêmén Kîfan û Bacgiran, di navbera leşkeren hikûmetê û serihildeyan de şerek derket, di encama wî şerî de mufrezeyen Xudo ber bi Kela Gîlenê ve kişîyan. Lî, xebat û tevger nesekinî. Li Kuçanê aligirêne Xudo bangek belav-kirin û gazî gelê Kurd kîrin ku li hember nîrên Ingiliz û paşverûyen ya hundûrî rabin.

şer de mîranî nişan dan. Ji êrisen me yên ku me bi şev tenzîm dikirin, leşkeren Ingiliz û hikûmet pirr ditirsand. Dî-warên graniti yên Kela Gîlenê ji bo wan ne ciyê gavavêtinê bû (Xummadov, B. Natsionalino-ovsoboditelinoe dvijenie Kurдов v 20-x godax XX v. - Izvestiya Turkmeneskoy Akademii Nauk. Vip. 5. Aş. 1975, r. 27).

Otorîteya merkezi ji bo vemirandina serihildanê ya li Şîrvanê hêzên nû dışandin. Sîleb û cephaneyen serihildeyan kêm dibûn.

Leşkeren Anglo-İranî der û dora serihildeyan girtibûn, destekên Xanan jî hatibûn birrîn. Mesele, Misr-Xan, êdi sadaqeta xwe nişanî hikûmetê dabû.

Di bin êrisen leşkeren yekbûyi yên General-Wali Kavamus Seltene, Xanê Bor-

Tehranê, kirîna serokeşîren Kurd û eşirên din, tehrîkkirina dijiminayetî di navbera wan de rolek mezin leyistiye. Ji hevetina tevgera gundiyan alikariya kar û barê Xan û rûhaniyên paşverûyan kîriye. Pêşveçûna tevgera Kurdi di demek wiha de pêk hat ku dezgeya feodalîyê umrê xwe tijî dikir û bi anarşî û tevlîheviya xwe ve winda dibû û bicianîna awayê îdarî û bacgirtinî ya burjuwazî ber xwe parastina di dereca me behs kir de, struktûra feodalîya gunda û metodê hilberîna berê.

Guherandina milkuyeta cemeeti ya li ser erda, bi milkuyeta şexsi ya Xan, Beg, Serokan, "civakên êl"ê bilêz ber bi feqîrbûnê birî ye. Lî, refbûna sosyalî hîn negiştibû wê sewîyê ku ferdên berê yên eşiran bikaribin bi

darêne têkoşîna rizgarîxwaz a netewî dihate propagandekirin li Azerbaycana İranê di bin seroktiya komîteya herêmî ya Partiya Demokrat a Tebrîzde, bi seroktiya Şêx Muhamed Xiyabanî û her weha Tevgera Cengeli li Gîlenê ya bi seroktiya Kuçek Xan bi firehî belavdibû (K. V-iy. Sotsialino-politîceskaya roli sektantsva i dervîşestva v Kurdistane.- Antireligioznik. 1931, No: 2, r. 27-28), gelê Kurdistana İranê bêteref nedima. Di bajarêne Kurdan û gelek bajarêne din de, ji berbirşiarêne tebeqen cihê cihê yên nifûsê encûmena hatibûn damezrandin. Ew bi wazîfeya bicianîna kontrolê li ser kîrinên idareya İranê rabûbûn.

Tevlîheviyên ku di herêmén Kurdan de, karbidesten İranê çedikirin, di nav gelê Kurd de

## SERÎHILDANA DI BIN SEROKTIYA XUDO DE

O. 1. JIGALINA

Heya yek ji wan bangan li ser deriyê balyozxana Ingilîstanê li Kuçanê jî hatibûn daliqandinê. Di van mercan de, Waliyê Xorasanê Kawamus-Seltene xwest bi serihildeyan re lihevbeh. Ji bo vê, wî Ketxuda yê Meşxedê şand ba Xudo li Kela Gîlenê. Lî wî nekaribû bi serihildeyan re li hev bê, û vegeriya Meşxedê bê tu encamekê. Piştre, Wali bi xwe çû Kuçanê ji bo ku feodalên mezin yên herêmê bibîne, serok eşîren Kurdan û Belûciyan-Nusret Laşger, Salar Şûcî Turbetî, Seîdê Heyder Berberî, Seîdê Murtaza Berberî û yên din ji bo hevdîtinê razibûn (İran, Tehran. 16. 09. 1920). Di demeke kurt de wan mufrezeyen xwe civandine û beşdarî leşkeren hikûmetê bûn. Lî rewş hat guhertin û piş re ev tiş pêk nehat.

Wê demê, serihildeyan Kuçanê bi dest xistin. Xudo hêzek leşkerî ji 500 kesen yên ku ji Meşxedê hatibûn şandin ji bo vemirandina serihildanê, tarûmar kir. Di nav serihildeyan de, jînên Kurdan ji bi qehremanî şer dikirin.

B. Xummad di derheqê serihildanê de agahdariyên enteresan diyar dike ku ji devên şahidên hedîseyan girtiye. Yek ji wan, Gulamzade, goti-nen Xudo bi bîr anîye; "me hemû êrisen dijmin bi paşve dişand, qumandanen me... di

nurdê Muazez û Misr-Xanê Şîrvanî yên ku ji aliyê Ingilizan dihatin destek kîrin, serihildanê ber bi vemirandinê ve diçû. Xudo bi hevalên xwe ve ber bi aliyê sînorê İran-Sovyetê çû. Lî, bi hinek serkar û beşdarên serihildanê ve hat girtin. Xudo, birê wî Hesen, ketxûdayê Kela Gîlenê Muhamed û Şaban Gîlenî, bi ferma Kavamus Seltenê ji Şîrvanê û yên din ji Meşhedê hatin şandin. Di 13'ê Tebaxa 1920'an de Kavamus Seltenê ji Tehranê diyar kîriye ku serihildan bi tevayî hatîye vemirandin. Karbidesten ku ji tevgeren gundiyyen nû li Kuçanê, Gîlen û navçeyen din, ditirsiyan, di van deveran de qışleyen jendermeyan, hejmarêne ciyêne qereqolan zêdekirin. Berxwedana Kurdan bi ser neket, dawî lê hat.

Di serihildanê de beşdarên esasi gundi bûn, lê hin feodalên Kurd ku ji kîrinên idareya İranî di navçeyen Kurdan de, ne razî bûn ew ji, ketibûn nav serihildanê. Serihildanê karekterêkî wê yê feodalî-gundiyyî hebû, ber bi antiemperyalistî û dij-hikumeti bû. Civaka serihildeyan şûura wan a çinayetî ne xurt bû. Heya, pîrsen wek, parvekirina erd û avê ji, berhevkirina bacan a bi ser û berî ji bilind nekiribûn.

Di serneketina serihildanê de dek û dolabên hikûmeta

nerazibûna xwe berên xwe bidin Xanan.

Cewkanîyên bingehîn yên belangazbûna ferdên eşira bi vî tiştê nû diyar dibe ku merkezibûn bû ku her ku diçû xurt dibû.

Di belavbûna bir û bawerîyen demokratik de li herêmén Kurdan, cirantîya bi Rusya ya Sovyeti ve jî ne mûmkün bû ku tesîr nekiribe. Bi taybetî, lewra Reza Xan sazkirina karbidestekî hişk li Kurdistana İranê wek wazîfeyek yekemîn didît. Di wan herêman de sîyaseta xwe li ser esasî sînorkirina tesîra Ingilizan ava dikirin, yên ku dixwestin tevgera Kurdi ji bo menfeetên xwe bi kar bînîn, berê xwe didan ku di herêmén Kurdan de ji Emperyalizma Britanya re qereqola pêş avakin. Di bin ferma wan de Xanên Kurd yên ku projeya damezrandina dewleta Kurdistana ya perîferî (herem-herêm) hildibûn. Ingilizan yên ku bi "Kurdofiliyê" xwe vedîşartin, dixwestin naveroka anti-emperyalistî ya tevgera Kurdi ji ortê rakin û Kurda bikin enstrumenta sîyaseta xwe ya emperyalî.

Tevgera Kurden Xorasanê ya ku wek parçek ji tevgera anti-emperyalî ya İranê diyar dibû, bi blindbûna tevgera rizgarîxwazî ya Kurden Bakura Rojava ya İranê kîriye yê ku serokê wî İsmail Xan Simko, reisî eşira Şîkakê bû.

endîşeyen gelek ciddî pêk anibûn. Di salên 1918, 1920, 1925 de li Mûkrî, Urmîyê, Hewreman û çend navçeyen din bi armanca xilaskirina Kurdan ji zordarîyên idareya İranê û ji ordiya Tîrka yên ku di van salan de li herêmén Kurdan li İranê dixwestin planen Pan-türkîstî yên hikûmeta Tîrkiye pêk bînîn, serihildanê Kurdan yên mezin çebûn.

Kurdên İranê bi aktivî ji bo damezrandina Kurdistana serbixwe têkoşîn dan. Fîkrîn ji bo Kurdistana serbixwe bi aktivî ji aliyê gelek organizasyonen Kurdan yên ku bi cîranîya İranê di herêmén Kurdan de li Tîrkiye xebat dikirin, dihate kirin. Daxwaza beşdarên tevgera Kurdi li Kurdistana Tîrkiye ya dostanî bi Rusya ya Sovyeti û defkirina ji welat emperyalistî Ingilizî, tesîra xwe li ser tevgera Kurden Bakura Rojava ya İranê kîriye yê ku serokê wî İsmail Xan Simko, reisî eşira Şîkakê bû.

Ev nîvîs ji rûpelên 46-47-48-49-50 ya pirtûka bi navê Natsionalinoe Dvijenie Kurдов v İrane (1918-1947) (Tevgera Netewî ya Kurdan li İranê) ku ji alî O. 1. Jigalîna ve hatîye nîvîsandin, J. Silav vergerand. Ev pirtûk di sala 1988'a de ji aliyê weşanxana "NAUKA" li Moskovayê hatîye çapkirin.

Armanc ji alfabetâ zimanekî ew e ku hemû dengen di wî zimanî de bi awakî nivisandî wek tîpan (nexşan, sembolan) nîşan bike. Eger bi zimanekî matematikî mirov bibêje, armanc ji alfabetê ew e ku; Deng=Tîp

Ev wekhevî ji bo alfabetêke ïdeal rast e, lê mixabin tu alfabet ji yên li dunyayê têbikaranîn vê wekhevîya matematikî pêk nayênin. Tevlî wê jî piraniya alfabetan kêm-bêhtir nêzîkî vê wekhevîyê dikin, lê ev yek ne bi hêsanî pêk hat.

Berî ku bigihije van formen xwe yên dawîn, riya dîrokî ya pêşveçûna alfabetan li cihaneh rêke dirêj û aloze bû. Hê berî 6-7 hezar salî bi awakî geleki prîmîtîv dinivisandin. Mirovên wan heyaman ji bona tiştîn di xweristê de wêneyên nêzîkî rastiyê çedîkirin, dîneqîsandin, wek ku çavên wan didit. Bi vî awayî serincen xwe li ser latan û dîwarên şikeftan dinivisandin. Lê pîr zor bû daku mirov karibe hayedarı û saloxdanan bi vî awayî binivîse. Nemaze ji ber ku hemû parçeyen axaftinê di vê nivisandina prîmîtîv de nebûn, wek;


**Navên bernes :** Alan, Reşo, Şérîn, Mêdi û yên mayî.  
**Navên razber:** raman, hiş, sewdan, biraû, hevaltî ûym.  
**Rengdîr:** kesk, sor, zer, mezin, sar, xweşik ûym.  
**Cinav:** ez, tu, ew, em, hun, ew ûym.  
**Lêker:** çûn, hatin, birin, firîn ûym.  
**Hoker:** zû, dereng, hêdî ûym.  
**Daçek:** bi, di, ji ûym.  
**Gehandek:** û, yê, ya, yên ûym.

Di demeke derengtir de nêzîkî çar hezar salan berî Zayinê li welatê Sumer (Kurdistan iro û Iraq) Sumeran ew nivisandina grafi geleki bi pêşde birin. Pêşî wan neqîş(wêne, graf, tîp) hêsan kirin, pişt re wateyên abstraktiv dan wan tîpan, wek:

- \* AN (stêr bi zimanê Sumerî)  
wateya ezman û xwedê stend.
- DU (ling bi zimanê Sumerî)  
wateya çûn û hişk stend.
- SAL (jin bi zimanê Sumerî)  
wateya mî stend.
- KUR (çiya bi zimanê Sumerî)  
wateya welat û zemîn stend.
- A (av bi zimanê Sumerî)  
wateya avî û kûr stend.

Di dema nêzîkî 2500 salan BZ (Berî Zayinê) disa li Sumer pêşveçûneke darîçav di awayê nivisandinê de peyda bû, ew jî di nivisandinê de bikaranîna forma kiteyi bû. Wan bêje didîtin wek ku ji kiteyan bihevketî bin. Bêjeyen yekkite wek: AN (stêr), UD (roj), E(xani), SU (dest), XA (masî), ŞE (simbil), A(av) û ym. di bêjeyen pirkite de bi kar dianîn bêyî ku girêdana wan bi wateya wan a hîmî ve hebe; bi tenê wek dengan li wan dinîfrin. Wek nimûne bêjeya DÜMÜMÉŞ (zarok, kur) bi van kiteyan dinivisin: DU-MU-ME-ES.

Tîpan (wêneyan, neqîş, grafan) hêdî hêdî dêmeki abstraktiv stend û hêsan bûn. Ji ber dêmî wan ê tûjî (bi serê darikeki li ser kelpîçan dinivisandin) navê "tîpen mîxî" li wan hat kirin. Tîpen grafi bi vî awayî dêmîn xwe guhertin:



Helbet ev gaveke pêşketî bû di dîroka nivisandinê de, lê hê gelek koteke di vê nivisandinê de hebûn. Di sala 2000 BZ nêzîkî 600 tîpen mîxî dihatin bikaranîn û bi ser de hin tîp di cihê gelek kiteyan de dihatin nivisandin, bo nimûne ÜD (roj) bi van awayan dikarîbû bhata xwendin wek: ûd, ût, tû, tan, par, rîr, hal, hûd, lih, hiş û ym. Vê yekê xwendin gelekî zor dikir û bû sedemek ku hin bi hin nivisandina bi forma

kîteyk ji meydanê rabe.

Li welatê Hititan (Kurdistan iro û Sûriye) nêzîkî salen 1700-1190 BZ pêşveçûna bingehî di nivisandinê de pêk hat, dema ku alfabetêke nû hat danîn. Ew alfabet bi tîpen mîxî dihat nivisandin, lê tiştî hîmî têde ew bû ku ji bona her dengeki tîpek hatibû danîn, wek alfabetêne me yên iro. Alfabetâ Hititan 29 tîp in û her bêje çawa dihat bilêvkirin, wilo dihat nivisandin. Ev metoda nivisandinê: Deng=Tîp bû ya serdest li dunyayê û şuna tîpen grafi(wêne, pictogram) û hiyerografi girt. Rast e, li hin ciyan wek Çin û Japonê ta roja iro tîpen grafi têbikaranîn, lê hînbûn û hînkirina nêzîkî 2000 tîpen grafi ne barekî sivik e, pîr alozî têde hene.

Tîpen mîxî hatin guhertin û ji jiyanê rabûn, alfabetêne nû peyde bûn, wek ên Yûnanî, Krili, Latîni, Erebi û yên mayî. Lê prensîba ku hatibû danîn: Deng=Tîp ma bingeha van hemû alfabetan.

Helbet alfabetâ kurdi ji, ya ji 31 tîpan e, ku Celadet Bedirxan daniye ew ji li gor prensîba: Deng=Tîp e û vê wekhevîyê pêk tîne, tevlî ku hin kêmayî têde hene. Ev kêmayî jî bûne sedema rexne û cihêbûnan di nivisandina kurdi ya bi tîpen latîn de, heta ku hin nivîskarêne kurdi xwestin bi serê xwe çareyekê bibînin û hin guhertin xistin alfabetâ kurdi.

Rexna pêşî ya li alfabetâ kurdi dibe ew e ku hemû dengen bi rastî ji bêjeyen kurdi derdikevin di alfabetê de nînin. Ji bona dengen pîr nêzîkî hev in, lê di hin bêjeyan de nerm têbikiran û di yên din de bi awakî hişk û qebe têbikiran; yek tîp hatiye danîn. Ji wan dengan re "dengen cêwi" tê gotin, ew ji ev in: Ç, K, L, P, R. Wek nimûne dengen cêwi di van bêjeyan de nerm in; cil(40), ka (pûşê gêrekirî), ling, pişt, birîn û ym., lê di van bêjeyan de hişk in û divê mirov devê xwe dagire: cil(teyrek e bi şev nêcîrî dike), ka, kal(zebesê negîhayî), lewlew, piling, birîn (qutkirin), reng ûym. Wek ji hînkeren bihurtî tê xwiyakirin hinek cihêbûnan di nav bilêvkirina dengen cêwi de hene.

Rexna din li alfabetâ kurdi ew e ku dengen H (H), E (E), X (X), S (S), D (D), T (T), Z (Z) ûym di alfabetê de nînin.

Rexna sisiya ya ku mirov carna dibihize, dibêjin gerek tîpa Q di alfabetê de nebe.

Gelo ev rexne di cihê xwe de ye yan na? Berî ku mirov bersiva vê pîrsê bide, divê mirov pêşî bersiva çend pîrsen din bide. Pîrs ji ev in:

1-Belkoya peydabûna her dengeki ji dengen di zimanê kurdi de çiqas e?  
Eger dengek yan çend deng di zimanê kurdi de kêm peyde dibin, hîngê eger di alfabetê de tîp ji bona wan dengan nebin jî disa ne kemasîyeke mezin e.

2-Gelo di her dengeki kurdi de çiqas hayedarf(informasyon) heye?

Pîrsa dawî êdK ji ber xwe ve tê bîra mirov ew jî:



3-Ma bi kêmayî çend tîp di alfabetâ kurdi de bes in, da bi ewledarî pevguhastina hayedarı û saloxdanan bi zimanê kurdi yê nivisandi bibe?

Ji bona bersivdana pîrsa pêşî min hiljimarek (statistikîk) ji peydabûna dengan re di zimanê kurdi de çekir. Da encama hiljimarek nêzîkî rastiyê be, divabû çend tekste kurdî bi awakî korfelaqî (random, sidfe) bîn danehev û ji wan komeke mezin deng(tîp) bîn hiljimartin. Li gor teoriyê gerek mirov hemû bêjeyen di zimanê kurdi de bide hev û ji koma hemû bêjeyen di zimêne de hiljimara dengan

# Alfabêta

Tablo numero 1: Statistika dengen kurdi

Rêza dengen(tîpan)	1	2	3
Deng(tîp)	A	B	C
Belkoya peydebûna dengen(tîpan) [%]	8.40	3.20	0.43
4	5	6	7
Ç	D	E	Ê
0.85	5.09	10.55	5.30
8	9	10	11
F	G	H	I
0.29	1.44	2.54	10.26
12	13	14	15
I	J	K	L
2.97	1.37	3.58	2.70
M	N	O	P
2.55	9.02	1.55	0.98
20	21	22	23
Q	R	S	Ş
0.21	5.77	1.99	1.47
24	25	26	27
T	U	Ü	v
3.47	1.43	2.74	2.02
28	29	30	31
W	X	Y	Z
2.88	1.57	2.27	1.09



çêke. Helbet karekî geleki mezin jêre divê, yê bi hêviya ensütûyên kurdi ve dimîne. Hiljimareke wilo ji bona zimanê îngilizî bi alîkarKya xwendekarêne universitan û teknîken nû çêbû.

Tevlî kemasîyeke, lê disa ev hiljimar geleki nêzîkî rastiyê dike, ji ber wek min got tekst bi awakî korfelaqî hatibûn stendin û çend hiljimaren cihê min dane ber hev, tev nêzîkî hev derketin.

Encama vê hiljimarek di tabloya 1. de ye û diyagrama li gor vê tabloyê di wêneya 1. de ye.

Da bi awakî xweşir berçav bibe, ka kijan deng ji yên din bêhtir e, li wêneyê 2. binêre.

Tablo û diyagram xweş didin xwiyakirin, kijan deng ji yên din bêhtir peyde dice. Dengen H, E, X ûym. di hiljimarê de peyde nebûn û vê yekê ti kêmayî nexist têgehiştina tekstên kurdi. Mirov dikare bi piştarşî bibêje ku hebûna van dengen li jor nîşankirî di alfabetâ kurdi de ne gerek e û rexneyen di vê bergehê de dibin ne di cihê

xwe de.

Dengê Q ji hemû dengen din kêmîtir peyde dice. Ev ji argumenteke xurt e di desîte yên dixwazin şuna tîpa Q tîpa K bi kar bînin. Ez bi xwe ne bi vê yekê re me, ji ber ku ez guman dikim ku ev deng ji zimanê kurdi yê kevnare tê, lê tu argumenten zanistî ji bona vê yekê di destê min de nînin. Hin dibêjin ku dengê Q ne xweş e, lê xweşîya tîpeke gerek bi zimanê ewrûpi re neyên pîvandin. Her milletek gerek xweşî û nexweşîya dengeki li gor karekter û hewcedariya xwe nas bike.

Ev xalê jêrîn dibe ku geleki bi babeta me ve negrêdayî bin, lê bi sûd e mirov wan bibêje, tiştîn balkêş di wan de hene.

1-Diyagrama wêneya 2. xwiyakirin, gerek ev tîpen buhurtî nêzîkî tiliya darådumê (sertili, tiliya navê) û tiliya fraxalîskê (tiliya şehadê) bin û tîpen kêm peyde dibin: Q, F, C, Ç û yên din li

urdî

## Zagrosê Hajo

alîyê tiliyên qeliçkê (qilican) û berqeliçkê (belican) bin, ji ber ku ew km têbikaranîn û bi vê ji nivîsandin hêsanîr dibe.

2-Mirov dikare peydebûna dengan di zimanê kurdi de bide ber zimanên din û bi faktorên din re vê diyagramê ji wek argumenteke objektiv bi kar bîne, ji bona xwiyakirina nêzîkbûn yan ji dûrbûna zimanê kurdi ji zimanên din.

3-îro li cihanê di nav çend zimanan de bi alîkariya komputeran gelekî nêzîkî wergerandina otomatîkî kirine û di demeke ne pir dûr de ewê bibe tiştekî rewani. Eger ev wergerandina otomatîkî di nav zimanê kurdi û yên din de pêk were, êdî gelek kotekiyêni di riya vejîna zimanê kurdi de têbikardin. Lî ji bona wergerandina otomatîkî gelek zanebûnên kûr divê, gelek faktorên zimên divê werin ronîkirin, gelek statistikîn fereh divê bêbêçîkirin û hiljimara di tabloya 1. de nimûneki piçûk e ji statîstîka pêwîst. Hê pîrsa struktura gramatîka zimanê kurdi, pîrsa bêjeyen hevwate (hevma'ne), hiljimara bêjeyen yekdeng, dudeng, sêdeng ûhd., hiljimara bêjeyen bi A dest pê dikin, bi B, bi C ûhd., hiljimara peyhevatina dengen AB, AC, AÇ,...BA, BC,...BAB, BAC,...ûym lê bêbêçîkirin.

Em vejerin pîrsa duduwa. Bersiva pîrsê wê bide xwiyakirin, ka gelo pêwîst e em tîpêni taybeti ji dengen cêwî re (Ç,K,L,P,R) deynin yan na.


Di zanistîyen teknîkî de şaxekî zanyarîyê heye jêre dibêjin **Teoriya informasyonê**. Di vê teoriyê de li zimên wek navgîneke (wasite) pevguhastina hayedariyê dinêrin. Elementen vê navgînê Deng (tîp) in. Dema di axafînê de deng li pey hev diherikin, hingî her deng bi xwe re hinek hayedariyê hildigire. Çiqasî hejmara dengan bêhtir bibe pêre kuantita hayedariyê bêhtir dibe. Kuantita hayedariyê ji bona zimanekî ideal li gor vê destûra matematîkî pir dibe.

I=n2, herweki

I=kvantita informasyonê ye.

n=hejmara dengan(tîpan) e.

Li diyagrama 3. xêza 1. binêre.



Wêne numero 3:

Diyagramê.

kvantita informasyonê

n|deng,tip|

Yekta kuantita informasyonê yek bît e. Bit gotineke îngilizî ye, wateya wê pitikek, piçikek, parçeyek piçûk e. Da zimanek ideal be ji bona pevguhastina hayedariyân gerek e belkoya peydebûna hemû dengan wek hev be û kuantita informasyonê ji ji bona wan wek hev be. Zimanê ideal yê xwedîy 31 dengan belkoya peydebûna her dengîkî wî dike :  $1/31 \times 100 = 3.26\%$ . Wek ji diyagrama numra 1. xwiya dike bi tenê dengê B nêzîkî vê numrê dike, yên din kêm-bêhtir jê dûr in.

Helbet ne zimanê kurdi û ne tu zimanên din yên xweristî ideal in, ji ber ku çend faktor hene ku kvalita informasyonê ya her dengî kêm dike û bihayê zimên ji wek navgîna pevguhastina hayedariyân kêm dike, ew faktor ji ev in:

a-Faktora pêşî belkoya peydebûna dengan

kurdî û bendên lipeyhevatina wan e. Wek nimûne nabe di zimanê kurdi de gelek dengen wek hev di bêjeyekê de li pey hev werin:(aaa, bbb, ccc ûhd.) û zimanê kurdi xwe geleki ji gihandina dengen dengdar diparêze, wek: ae, ai, aî,..ea, eî,...ia,io,..aei,ao ûhd.

Ev yek dihêle ku herikandina informasyonê ne li gor hejmara dengan bêhtir bibe, ew hinekî kêmteri e. Li diyagrama 3. xêza 2. binêre.

b-Faktora duduyan vekîta (dKktata) zimanê kurdi ye, ew ji herikandina hayedariyan hê kêmteri dike, ji ber ku her bêjeyeke kurdi divê bi yek awayî were nivîsandin li gor destûra nivîsandina zimanê kurdi. Li diyagrama 3. xêza 3. binêre.

c-Faktora din ya ku herikandina hayedariyan kêm dike rîzimana zimanê kurdi ye. Her parçekî axaftinê cihekî xweyi taybeti di hevokê de divê bigire û eger bêje ne li ciyê xwe yê rast be, dibe ku wateya hevokê were guhertin û têgehîştina wê ji şaş be, wek nimûne:

Nêçîrvan şer girt.

Şer nêçîrvan girt.

Wateya van hevokan li gor cihekî nêçîrvan û şer tê guhertin.

Li diyagrama 3. xêza 4. binêre.

ç-Faktora dawî, ya bendan li pêsiya herikandina hayedariyan dideyne bîrsayıya (logika) duris e, ji ber ku hevokê bê bîrsayı informasyonê bi süd nadin û wan bêhtir ji nakin. Wek nimûne : Şer mirov e. Tevlî ku ev hevok ji alîyê vekîti û rîzimanî ve rast e, lê tu informasyonê bi süd neda ûzanîna me bêhtir nekir. Li diyagrama 3. xêza 5. binêre.

Ev faktorên bîhurtî hemû bi hev re bendan datînin herikandina pêsiya herikandina hayedariyên zimanê kurdi û dikin ku kvantita hayedariyê ya ku her deng hildigire, kêmteri dike. Ji ber vê yekê dema mirov dixwaze nûçeyekê yan ramanekê bigehîne miroveki din, divê gelek dengan yan ji gelek bêjeyan û yan ji gelek hevokan bîbêje, binivîse daku bigîhîje armanca xwe.

Eger mirov bikarîba bi zimanekî ideal wê nûçeyê yan ramanekî bigehîne, wê bi gelek kêmteri deng, bêje û hevok armanca xwe pêk bîne.

Ev pîrbûna dengan , bêjeyan û hevokan ku mirov bêçare di zimanê xwe de bi kar tîne di teoriya informasyonê de jêre dibêjin redundancy (redundans).

Da em bizanibin redundans ci ye, em dikarin bîbêjîn ku ew weke gotina inflasyonê ye, ya di warê mewdanî (mali) de . Lî ev inflasyona di zimên de ye. Da bêhtir em redundansa di zimên de nasbîkin emê li serpêhatiya nimûneyê temaže bikin. Salarê Gernûs ji Tirba Spiyê ye. Ew li Amedê kar dike. Salar her heftê roja ïnê

"êvarî" û "bi trêne" ji hê bavêje.

Telegram bû bi vî rengî:

"Ezê 27.7.1990 seet 17.00 vejerim malê."

Mêrê te

Salarê Gernûs

Eger ew hin bêjeyen din ji ji telegramê bavêje wek "malê", "mîrê te" û "Gernûs" Bêrîvanê wê disa bizanibe ku mîrê wê ci wextî vedigere malê.

Wek ji hînkerê buhurtî hat xwiyakirin bi nebûna çend bêjeyan di tekstîde buhayê wî yê hayedariyê kêm nebû. Ew ji ji ber hebûna redundansa di zimên de ye. Vê gotinê ji em dikarin li ser dengen di zimên de bibêjin. Nebûna çend dengan di zimên de buhayê zimên wek navgîna pevguhastina hayedariyan pir kêm nake, ji ber ku redundans di kevirê pêşî de ji, yê avaya zimên de di dengan de heye. Ev ji bersiva pîrsa diduya ye. Ji bona dengen cêwî tîpêni taybeti ne gerek in, navin û alfabetâ kurdi ya ji 31 tûpan, ku Celadet Bedirxan daniye gelekî durist e ji bona zimanê kurdi. Ji xwe gelek ji van dengen ku danûstandin li ser çêdibe herêmî ne û ne li seranseri Kurdistanê têbikaranin. Wek nimûne li herêma bajarê Amûdê dibêjin: me'er, ne'el, hinar, xeyd ûhd., lê li herêma bajarê Tirba Spiyê ji wan bêjeyan bi xwe re dibêjin: rnar, nal, hinar, xeyd ûhd.

Ji alîkî din ve li herêma Tirba Spiyê dibêjin: behr, ttivir, dderew û hd., lê li herêma Amûdê ji wan bêjeyan re dibêjin: par, tivir, derew û hd. Bêguman ev cihekîn dengan li herêmîn din ji yên Kurdistanê heye, lê nabe mirov yek bêjeya kurdi bi çend awayan li gor zaravên herêmî binivîse û tîpêni nû têxe alfabetâ kurdi. Eger em vê yekê bikin, êdî ne 31, lê 41 tîp ji wê têra zimanê kurdi nekin.

Redundans di zimanê kurdi de çiqas e?

Min dixest ez ji were bîbêjîm ku li gor bêhvan instituta kurdi ew hewqas e, lê mixab in hê redundansa di zimanê kurdi de nehatiye hejmartin. Redundans zimanên din hatiye hejmartin, wek ya îngilizî ku dike 50% û zimanê çeki dike 32%. Çawa tê xwiyakirin redundans di zimên de ne hindik e û gelek cih û wext digire û wek faktoreke negatîv dilize, lê ji alîkî din ve dinamika zimên mezintir dike, ev ji faktoreke pozitîv e, nemaze ji bona helbestvanan, keysa wan çêtir li nivîsandîn tê.

Ji bersiva pîrsa sisiyan (alfabetêke ji çend tîpan besi zimanê kurdi ye?) armanc ne ew e, da alfabetâ Celadet Bedirxan were guhertin. Lî kurd êdî gelek caran makînên modern , wek komputer û teleks bi kar tînin, yan ji telegraman ji hev re rî dikin û wek hun dizanin makînên di van digital de alfabetêke standard tê bikaranin. Ew alfabet ji 32 tîp nîşandekan e, lê di nav wan de tîpêni kurdi (Çç, Èè, Şş, Üû) nînin. Ez dixwazim bidim diyarkirin ku bikaranîna vê alfabetâ standardî navnetewi ya makînên digital; dema pêwîst bebes e jbona nivîsandina bi kurdi û pê mirov dikare bê zehmetî tekstîn kurdi bîxwîne û têbîgehê. Ji ber ku redundans di zimên de heye, êdî dema çend tîp ji tekstê bikevin ji disa sewdanê mirov bi xwe wan diavêje nav tekstî.

Da ev gotin bête diyarkirin min çend tekstîn kurdi yên cuda cuda ku bi alfabetâ standard hatîbûn nivîsandin da çend kesen kurd ku bi kurdi xweş dizanîbûn bîxwînin. Wan hemûyan bê zehmetîyeke mezin tekst rast xwendin û têgehîştin. Fermo hun ji vê teksta ku Kamuran Bedirxan nivîsandîye bîxwînin:

"Gunde me

Rojhilat e. Ezman hedi hedi bi reng sor u zer dikene. Sivan bi pez u seye xwe ve ji gund derdikeve. Gavan ji dewer dide hev u bi cole ve dice. Deriyan xaniyan vedi bin u gundi dicin zeviyen xwe.Zaro, ji ber ko dibistan girtiye ji xwe re digerin, derdikevin cole, be diuguherin. Jin u kecen gund dest bi kare mala xwe dikin. Hin ji

kaniye ave tenin, hin nane xwe dipejin u hinek ji berivaniye dikin. Hinek ji wan tesîye diresin, tevn u mafuran cedikin. Di gund de her kes bi dîlxwesi dixebe. Gundî hemu hez ji hev dikin, ew dizanin hemu birayen hev in u wek miroven berberiya hev u din nakin."

Eger we ev teksta rast xwend û hun têgehîstin, êdî bersiv gekekî nêzîkî rastiyê dike. Dibe ku cara pêşî mirov tekstê wilo bîxwîne çetin be, lê ev tiştekî normal e. Ya girîng ew e ku makînên digital û alfabetâ standard bi kêri zimanê kurdi tê.

Di dawiya vê gotarê de hê sê tiş hene gerek e werin gotin ew ji ev in: a-Gerek e her tîpa alfabetâ kurdi cihekî xweyi taybeti di nav rîza tîpêni din de bigire û gereke ew cih tu carî neyê guhertin, ne wek ku carna di ferhengen kurdi de buye. Divê her tîp xwedî numreyekê be û wek numreyan rîza tiştan nîşan bike, ew ji li gor vê nîşandin: A=1, B=2, C=3, Ç=4, D=5, E=6, È=7, F=8, G=9, H=10, I=11, İ=12, J=13, K=14, L=15, M=16, N=17, O=18, P=19, Q=20, R=21, S=22, Ş=23, T=24, U=25, Ü=26, V=27, W=28, X=29, Y=30, Z=31

b=Di destpêka danîna alfabetâ kurdi de bilêvkirina tîpêni bêdeng nehatibûn diyarkirin, êdî hema her yekî ew li gor xwe bi lêv dikirin, wek nimûne tîpa B dihat xwendin: ba, bê, bî û yan ib. Ev neyekîti di bilêvkirina tîpêni din de ji hebû.

Pêşniyara min ew e ku tîpêni kurdi bi vî awayî bêbîxwîne, nemaze ku li welêt ji di kursen zimên de şagirt bi vî awayî hînbûne:

A (a), B (bê), C (cê), Ç (çê), D (dê), E (e), È (ê), F (if), G (gê), H (ha), I (i), İ (î), J (jê), K (kê), L (il), M (im), N (in), O (o), P (pê), Q (qe), R (rê), S (is), Ş (ış), T (tê), U (u), Ü (û), V (vê), W (we), X (xê), Y (yê), Z (zât).

c-Gerek e ji bona her tîpeke alfabetâ kurdi navekî bernas hebe. Carna divê mirov bi awakî zelal tîpekî nîşan bike, hingê eger navek ji bona wê tîpê hebe, êdî ev yek pîr hîşanî dike. Di kursen zimên de piraniya navn jînîn hatine xwendin û pêşniyariya min ew e, ku ev nav bibin yên standard ji bona tîpêni alfabetâ kurdi. Nav ji ev in:

A-Alan, B-Bêrîvan, C-Canê, Ç-Ceto, D-Dara, E-Evîn, È-Èlixan, F-Findê, G-Goran, H-Hêlin, I-İ-İskan, J-Jala, K-Kawa, Leyla, M-Mêdyâ, N-Nazê, O-Oldar, P-Perî, Q-Qehreman, R-Rindê, S-Salar, Ş-Şerîn, T-Têlîcan, U-Ü-Üsiv, V-Viyan, W-Welat X-Xecê, Y-Yezdansê, Z-Zinê

Di vê gotarê de min xwest ku çend pîrsen alfabetâ zimanê kurdi deynim ber xwendevanan û ditinê xwe li ser bîbêjim. Bêguman pîrsen alfabetâ kurdi hê kûrtir e. Yek ji wan pîrsan wek hun dizanin ew e ku em kurd bi sê alfabetan dinîvisin. Ev ji nexweşyekê giran e û jê gelek nexweşyeyen din dizên ta çareyek jêre neyê ditin em nikarin bîbêjîn ku ev alfabet ya hemû kurdan e.

Çavkani:

1-Klima J.: Lide Mezopotamie. ORBIS PRAHA 1976

2-Cigerxwîn: Tarixa Kurdistan 1,

Stockholm 1985

3-kollektiv: Teorie Informace. Skriptum

4-Hibo A.: Tarix we neş'et el-kitabe Serinc:

Belko: îhtîmal, ev gotin di Dîwana Melayê Cizîri de bi wateya îhtîmal hatiye şirovîkîn.

Hiljimar: statistik, ev gotin di ferhenga Estêrey Geş de hatiye bikaranin.

Vekît: diktat, îmla, di kovara Hawarê de hatiye bikaranin.

Biheketi: consist of, mu'ellef min, di Hawarê de hatiye bikaranin.

Bîrsayî: logik, ji ferhenga Estêrey Geş

Rewan: daric, ji Dîwana Melayê Cizîri

Xwerist: serîst

Yekta: unit, wehde (Hiljimartina dengan tenê ji bo Kurmancî çêbuye. Soranî û Dimîli neketine ber vê statistikî.

# Çîrok

Berî hatina Kemal Paşa, leşker û memûrên bajêr xurcîlîn. Ü rûniştvanen wê ji tîrsa ketin hev. Mane bajar ne ji mîjve, pişti herifandina serihildanê di xwînê de gevîzibû...

Ev xurcîl kete nav zîndana bajêr ji ku bi serokên serihildanê dagirtibû. Danê êvarê girtî jî bi vê teygerê hisiyan.

Bi xwe Doktor Husnî Efendi ji roja girtina xwe, di huçra tenhayî de bû. Li gel ku di ser girtina wî re bêtirî mehekê derbas bûbû, ji biliş işkencê û mûhawela bê rûmet-kirina wî, tu tehqîq pê re çênebûbû. Di vê rewşa ha de, hertim ew bêdeng dima û eşâ nava xwe nedida der.

Wê rojê, çûn û hatinek zêde bi zîndanê ket, vê yekê bala Doktor Husnî ji kişand, sed û yek raman di serî de geriyan.. Teprepê nêzîkayî li huçra wî kir. Kilit li derî hate dayîn, bi lez sê dergevanan du kursî û masak biçûk derbasî nik wî kirin, fanosa pêxistî danîn ser masê û berî derkitinê, yekî ji wan got:

- Xwe temîz bike, divê tu di hizûra hakim beg de, wek însana bî!

Wî ne got wê xwe çawa di vî

dest pê kir, wilo ji berdewam kir. Yê girtî, bi awakî matmayî lê nêri, fena ku bêje: "ev dengê bilind ji bo çiye? Mane bê vê yekê deng tê min" Çilo ew giranî rabû ser xwe, wilo ji bi giranî û ne bê meznayî bersîva xwe da:

- Ez Doktor Husnî efendi me. Merivê bi navê hakim li başkatibê xwe nêri, mîna pê re bi peyive, got:

- Lî binêre, ji ber xwe fedî nake û ji xwe re dibêje; "ez doktor im" Me ew kire doktor, da ew bikeve nav merivan, lê ne xwest ji nav hovan derkeve. Ü bi wan re kete isyanê jî.

Merovê girtî tinaziya hakim di pişti guhêñ xwe re avet û tiştek negot.

- Baş e, -hakim dîsa peyivî- li gora úrf û adeta medeniyeîê, emê nuha te mahkeme bikin. Tu li ser hişê xwe yî, tu dikari bersîva xwe bidî?

- Helbet, yê girtî bi kurî got.

- Demek wiha ye, emê dest pê bikin, -hakim li merovê tenîsta xwe nêri û got, anha em çi bibêjin, binivise.

Bâskatib, bêdeng serê xwe bi erê hêjand û bêtir kësa xwe li nivîsê xweş kir.

- Li gora ku tê gotin, - hakim bêyi ku li merovê girtî binêre, gotina xwe domand- di isyanê de tu yekî herî aktiv bûyî. Rast e?

- Belê, ji bo parstina navê miletê xwe, min xebata aktiv dikir...

- Tu aktiv bûyî an na? Ev ji min re giřing e û herçî gotinê vala ji xwe re bîhêle.

- Di vî warî de, min çarekê bersîva xwe da û ez eyîn gotinan dubara dikim û tekîdî li ser wan dikim.

- Ev gotina ku tu navê xebatê lê dikî, di qanûna komara me de, xiyanet e û cezayê wê idamkirin e.

- Ez qanûna we li ser xwe qebûl nakim...

- Em pirsa vê yekê ji te naki...

- İca mehkeme ji bo çi ye? Edî hakimzanî ku merivê girtî ji bo daqurtandinê ne gepek nerm e. Ji ber vê çendê, wî xwest rê li ber bibire:

- Ji ci ye? Helbet ên wek we qanûnê fam nakin... Lî tevî wiha ji em ji riya xwe dernakevin. Heger wext li me teng jî bibe, emê dest ji qanûnê bernedin. Niha ji li ser vî bingehî em te mahkeme dikin... Li gora tişten ku di desten me de hene diviyabû, tu deh caran bihata daliqandin..

Doktor Husnî, li ser van gotinan di ber xwe de bişîrî û bi qerfayetî got:

- Spas ji bo we! Hûn geleki dilovan in, ji ber ku hûnê di şûna deh caran de, carekê min bi darvekin..

- Hiş! Devê xwe bigre!- Hakim xwe negirt û bi ser merovê girtî rabû, em bîhna xwe li te fireh dikin, lê em dibînin tu ne xercê vê yekê yî..

Bînekê deng ji herduran biliya. Lî wexta hekim tunebû, çimkî hîn gelek girtî bê mahkeme mabûn. Ji ber vê yekê wî pirs qut birî û got:

- Qanûn di ser her tişti û her kesî re ye. Li gora wê, divê em te bi darvekin. Bi xwe me biryara vî cezayî li ser te da.

Di vir de, hakim li Doktor Husnî nerî, da bizanibe reaksiya wî çiye. Lî wî dît ku ew bi awakî

bê mane lê dinêre û bi xemsarî li benda dawiya gotinê ye. Hakim ji çavên xwe bawer nekir û jê pirsî:

- Dengê min hate te? Te ji min fam kir?

- Èrê, merovê girtî bi kurî got. Diyar e, berxwedan û giraniya Doktor Husnî, şopa xwe li nik hakim hişt, loma ew bi tonek din çû pirsî:

- Tu li ber xortaniya xwe nakevî? Tu poşman nebûyî?

- Min bi irada xwe, da ser riya azadiyê û bi irada xwe jî diçim, ica ezê çîma poşman bibim?

Di hundîrê vê mehê de heyfa Doktor Husnî bi du tiştan dihat; yek jê ew bû ku ji bo serihildanê xwe baş amede nekiribûn. Tişte din jî ew bû ku edî ewê nikaribe qewîtiya xebatê bighîne nişfîn bê. Wî gelekî dixwest, li ber mirinê, bi dengekî bilind, gazî qewmî xwe bike û bibêje; "ji bîr mekin, qayîş û berbertiya di nav eşîrên me de, kir ku em bi ser nekevin..."

Lî ev, nayê wê manê ku heyfa Doktor Husnî bi xortaniya wî û jîna can a ku wê li pey bimîne, nedihat. Lî belê ku xwîn bi vî tişti diniqusî dilê wî, seraser cok li ber digirtin û rîne dida lawazîye "

Bixwe çavkaniya ku Doktor Husnî hêza xwe jê digirt û serê xwe li ber dujmin ne diçamand; hezkirina bêşînor ji milet û welatê wî re bû. Ü kîna res ku bi dijimin re dikîsand... Ü pêla ew mirinê difikiri, xwe bi xwe qînetâ xwe tanî û ji xwe re digot: "Ku merov kole û bindest be, edî ew bêruh e.

Ma pêwîstiya gewdê bêgîyan ci ji jîyanê heye?!" Diyar e, vê bîreweriya ha dikir ku Doktor Husnî xwe li ber işkencê bigre û li ber mahkemê ji, ji desthilanînê nekeve û bi mîrânî, nav û rûmeta xwe biparêze..

- Ci serikî hiş! Heya li ber mirinê ji, ji ehmeqiya xwe danakeve! Min texmîn dikir, tu dê doza dilovaniyê ji Kemal Paşa biki û bi vê yekê, wê werîs di hustiyê te de sist bîba, -hakim bi konayeti çû gotinê.

- Kesî gunehkar doza dilovaniyê dike.. Bi xwe, ez xwe gunegkar nabînim, heya ez dilovaniyê bixwazim.

- Diyar e, heya mirinê, tu dê dest ji ehmeqiya xwe bernedi? Dêmek, berê sibehê tu dê bi sêpiyê bête daliqandin...

- Her biryara bi darvekinê hatibû stendin, ica ci hewciyê vê listîkê bû?

Bi rastî ji, ev mahkeme listik bû. Ji ber ku ferman ji jor ve hatibû ku berî Kemal Paşa bighê bajêr, diviya bû serokên serihildanê bêne idamkirin. Loma ji hakim mahkema xwe ya meydani li dar xist û listikê di zîndanê de dest pê kir. Tevî wiha ji hakim gotina Doktor Husnî li ber guhêñ xwe berda û bi awakî ji karê xwe razî, axafîn domand:

- Helbet, kesî gunehê xwe bizanibe, wê cezayê xwe ji bizanibe... Baş e, biryara me ev e. İca daxwaza xwe ya dawî bibêje!

Doktor Husnî, cara peşî bi awakî matmayî li hakim nêri. Wî wilo temaşê lê kir, fena ku bibêje: "maql u ku hîn tiştekî insaneyî be we re mabe!"

Nêrîna merovê girtî bi hekim xwes nehat. Loma ji wî bi

madtalî got:

- Tu ci wilo zîq dinêri? Binêre tevi hovitiya we, her em mûamelâ insanan bi we re dikin...

Doktor Husnî xwest bibêje; "Ma hûn fedînakîn û gotina insanan û "însaniyetê" tînin ser zimanê xwe, lê diyar e ji tîrsa ev fersend ji destê wî here, xwe bêdeng kir û ev car pêşî bû ku, pişti gotina xwe, kêmâsi daqurtand.

- Leyse wexta me teng e, daxwaza xwe bibêje!

Di vê bîstîkê de, Doktor Husnî ji nişka ye bi gîrre bayê azadiyê hisiye. Edî gotin ya wî bû û diviyabû biçiya serî.. Çend daxwaza bi hev re hatin. Lî bêyi ku bizanibe çîma, doza vê daxwazê kir:

- Kevaniya min li bajêr e, heger hûn di gotina xwe de rastin.. Ez dixwazim bi xanima xwe re seetekê bimînim..

Di vir de Doktor Husnî bîhnekê awestiyayî ma û di navbera erê û nayê de got:

- Ez dixwazim pê re razêm..

Li ser vê daxwazê, hakim ji darekê ket. Wî texmîna daxwaza her tişti dikir, lê ne ev.. Ji ber vê yekê, destpêkê wî nizanibû ci bibêje.. lê belê hisiyeta payetiya di nava wî de û tercûba wî ya bi girtian re, bû sedem ku ew zirt û hişk bimîne. Ü bi xeyd vegeeria ser gotina Doktor Husnî û got:

- Kê ji te re gotiye, em di gotinê xwe de ne rast in?!

Da ku peyvîn zêde nekevin meydanê, Doktor Husnî gotin li ber girt û got.

- Bi xwe min daxwaza xwe got.

- Ma ev daxwaza e? Ez ji te dipirsim ev daxwaza insana ye? Tenê heywan berî serjekirinê, dikarin êm bixwin.

Ha, yan ji tu dixwazî tovê qewmî xwe pirr bikî? Ma tu nizanî ku toxumê we bêber e.

İca hûn ci hindik bin û ci piir bin bêfede ye.. û tu carî hunê, bi ser nekevin...

Bi van gotinan, Doktor Husnî di nava xwe de eşîya û qîçqîci û heyâ jê hat xwe girt û ne bêkerb û kovan got:

- Xebera we ye...

Hakim gotin ji devê wî girt û pirsî:

- Ci xebera me ye?

- Bi rastî ji emê bi ser nekevin, heger em ji we re bibin tajî.. Ma kê li Belqanê bi dijminen we re şer kir? Ma ne em bûn? Ma kê civîna Sîwas û Erzuromê li dar xist? Bi saya kê îngîliz ji Stenbolê derket û bavê we Kemal Paşa hate ser hukim? Hûn pê dizanîn ku dîsa em bûn... Ü hemberî vî tişti hûn îro me dipelixinîn..

- Devê xwe bigre!- Hakim bi hêrs û heqaret çû gotinê, çimkî wî dît ku ewê nikaribe reda vê rastiyê bike, we xwe ji xelkê re nekira ker! We xwe kir ker, loma ji ew li we siwar bûn...

Vêga Doktor Husnî ne bêheyecan lê vegerand:

- Polis û muheqiqen we işkence girtiyan dikirin, ez dibînim hûn ji, ji şûna ku min mehkeme bikin hûn heqaretê li min dikan, hûn dikarin cezayê herî bilind bidin min, lê ez heq nadim we, hûn gotinê ne xweş bidin rûyê min..

Bi rastî ji, hakim bi xwe hesiya ku ew lingê xwe zêde radide. Lî ji bedêla xwe bilomine, bi qerf li merovê girtî vegerand:

- Maşallah! maşallah ica ji doktoriyê tu bûyî ebûqat! Tu gîlî li min naki?

- Giliyê me li ba Xwedê û tarixa însaniyetê ye...

- Niha Xwedê bi bîra we hat! Gava we isyan nekir, hûn bi Xwedê û dirokê nefîkirin.. lê niha? Hakim bêyi rê bide merovê girtî, li başkatibê xwe zivirî û got:

- Binîvise, me biryara ku ewê destê sibehê bête bi darvekin, stend.

Hakim bi gotina xwe re, rabû ser xwe. Bi derketina xwe re, li Doktor Husnî nêri. Yê dawî, bi meznayî û bêyi ku mijankê xwe bişkîne, çavên xwe xistin ên hakim. Di awîren wî de, daxwaza merhametê nebû. Ü ev tişti di wan de dihate xwendin: "mane berxê nêri ji bo kêre ye.." Ü dî ku hakim, bêtir bi mezinahiya merivê li hemberî xwe hesiya. Dibe ji ber vê çendê, ica bi marifet jê re got:

- Emê daxwaza te bi cih bînin, haziriya xwe bike!

Bi vê gotinê, hakim bi lez derket. Dûre bi serokê dergevanen zîndanê da zanîn ku pêwîst e odak wiha ji Doktor Husnî û jîna wî re bête amadekirin, ku ew bi xwe karibe qelawiziya wan bike. Wî biryara vî tişti, stend, çimkî dixwest bi çavên xwe bibîne, gelo merovê girtî, yê li ber mirinê, wê bikaribe pîrekê bistîne?

\*\*\*

Şev derbasî nîvî xwe yê din bû. Dergevanen zîndanê, berî ku Doktor Husnî û kebaniya wî derbasî oda ji bo wan amedekirî, bikin, hakim bi xwe li ciyekî wiha rûnişt ku dikaribû wan bibînîze û bibîne.

Bi xwe, ji bili textekî bi lihêvan raxistî û fanosek pêxistî, di odê de tiştekî din nebû.

Dergevanen, pêşî Doktor Husnî derbasî odê kirin û dûre kebaniya wî xistin hundir. Berî ku derî li pey xwe bigrin û derkevin yekî got:

- Muhleta seetekê bi we re heye.. Di vê bîstîkê de, Doktor Husnî xwe azad dît. Bi vê bîrûbaweriye li jîna xwe nêri û pêve çû.. Ez hêmbez kir û bi dilovani destê xwe danî ser pişta wê, devê xwe nêzi guhê wê kir û got:

- Şukriya min, tu nizanî çîqasî bas e ku berî mirinê ez te dibînim, - Doktor Husnî bi vê gotinê bêtir ew bi ser xwe de givaşt.

Ji nêrîna pêşî Şukriya zilamê xwe nas nekir. Ji wî, tenê dengê wî mabû. lê bi dîmenê xwe, ew ketibû rengê insanekî din; riya dirêj, porê gijo-mijo, madê spîcolekî û çavên xarbûyî ne yên Husniyê wê bûn. Wê bi awakî alavî serî xwe xiste defa singa wî û ev gotin ji devê wê filîtin:

- Pepûk! Xwedê mala wan xirab bike, ci bi serê te anîne?

## Rapora lêkolînên li ser herêma Şirnexê:

### "Herêmek ji ruhberan xalî tê pêkanîn"

**R**oja 28'ê ûlonê heyetek ji 40 kesan pêkhatî li dorûbera Şirnexê lêkolînek kir û raporek ji sê rûpelan pêkhatî hazir kir û da çapemeniyê.

Di nav heyetê de Serokê Partiya Sosyalist Ferît Îsever, Endamê HEPê yê Diyarbekirê Tahîr El-verdi, Serokê Komela Mafêna mirovayî (KMM) ya Diyarbekirê Hatîp Dîcele, Serokê KMM ya Siirtê Av. Zubeyir Aydar, ji Sendika Petrolê ya Batmanê Ahmet Teymurtaş, Ji Rêxistina Muhendizên Avayî ya Diyarbekirê Esat Bingom, ji Rêxistina Muhendizên Makînan ya Diyarbekirê M. Salih Gümmüştêkîn, Ji Rêxistina Muhendizên Zîraî ya Diyarbekirê Refîk Karakoç û li ser nave KMM ya Nisêbînê Dr. Cemal Kahraman û gelek rojnamevanê ji welêt û ji derveyî welêt hebûn.

Rapor pişti ku lêkolîn, buyer û belgên bi destxistî pêskêş dike tespitên heyetê bi vî awayî diyar dike:

1- *Li herêma Botan ku tevgerên çekdarî lê bi tesîr in, li hember gel siddetek bi her awayî hatiye li dar xistin û siyaset ewe ku herêm bi tevayî ji ïnsan bê xalî kirin. Di çerçeva vê siyasetê de tê xwestin ku herêmek wilo bê avakirin ku, bahrîna miyan, vîzîna mêsên hunguv neyê, daristan şewitandîl û çiya rût bimînin, dengê zarakan olan nede, dar û mal û merov tunebin. Encam vê siyasetê, ji 38 gundê Şirnexê(ye ku berî bibe wilayet) 27 gund û tevayiya 81 mezrayê wê, çima ku gundiyan çekê dewletê hilnedan, hatin valakirin û şewitandin, gundi bi zorê; bêyi ku bedêla mal û mulkê wan bê dayin hatin qewirandin. Yê xwedî-hebûn barkirin cûn li der û dora bajarê Adenê û Mersinê di xaniyêna baraqe de bi cih bûn, yê belengaz di welatê xwe de hatin mişexkirin, di sertê nêzbûna zivistanê de, bi zarokên xwe ve (ku bes ji yê 0-3 saliyan bi sedan hene) bi nexweşiyê xwe ve, li ser riyan, li gundê rex caddan û li derûdora bajarê Siirt û Şirnexê di konêñ reş de dimînin. Li herême Bey-tülşebabê, Uluderê, Çataxê, Guçlugonaxê, Erûh û Perwariyê valakirina gundan her bi lez û beza xwe berdewam e.*

Berpirsiyaren van karêñ xeyrî huqûqî û zordarî, divê bizanibin ku bi van karêñ xwe, ew pîrsan girantir dikin, di civaka me de birinê kûrtir vedikin ku tu carî wê neyên cebirandin.

2- Heyeta me tespit kiriye ku ew mutabeqata li hember pîrsa Kurdi ku di destpêka meha Nisanê de di navbera Serokkomar, Serokwezir û her du partiyêñ muxalif de muşterek hatiye qebûlkirin, tê domandin. Naveroka mutabeqate ew e ku xelkê "herêma navber" ya di navbera gerila û dewletê de, bi darê zorê tê pelçiqandin. İro bi taybetî li herêma Botan li dijî gel şîdetek bêperwa heye.

3- Heyeta me tespit kiriye ku valakirina gundan bi taybetî pişti krîza Delavê Besra bi lez û beztir bûye. Hukûmet firset ji tevlihevbûna ku emperializmê li

herêmê pêkaniye, distire û vê siyaseta zordariyê tûjtir dike. Tirkîyê ji Konseya Ewrûpa re da xwiyakirin ku li 13 bajarênu ku Qanûna Rewşa Awarte lê hatiye lidarxistin, di kar û barê xwe de wê Peymana Mafêna Mirovayî li ber çav negire. Mana vê yekê bastırın, iro li herêma Botan tê muşahedekirin. Daristan û baxçen fêkiyan têneh mehûkirin. Li herêmê li hember gel gerekî ne ilankirî tê meşandin. Mirina ïnsanên bêguneh, êdî bûye buyerek adî (normal)

4- Biryarnama Sansur û Surgûnê bi temamî tê bicîkirin. Bê tazminat û bê xerca rê û bi zorê ïnsan têneh mecbûrkirin ku dev ji gundêñ xwe berdin. Ew jî di qonaxa pêşiyê de têneh Şirnexê, Siirtê û Cizirê, ji ber sedemêñ kar nedîtinê pasê berê xwe didin bajarêñ mezin yê Rojava. Bi kurû ji Rojhilat ber bi Rojava ve, şirgûnek bi darê zorê tê meşandin.

5- Çapemeniya(pressa) Tirkîyê li hember van buyeran terciha bêdengiyê kiriye. Xwedî qelem û xwedî rojnamen Stenbolê pişta xwe dane jiyana trajik a gelê herêmê. Çapemeniya rojane iro ji piştgiriya wê mutabeqata çinêñ serdest ya meha Nisanê dike. Em carek din bang li çapemeniyê dikin ku hay ji berpirsiyariya xwe ya dîrokî hebin.

6- Tirkîyê çendekî berê hin maddên Peymana Mafêna Zarakan ya NY, îmze nekîrin. Li gor vê, Tirkîye berpirsiyariya wê yekê nade ser milêñ xwe ku maddên 17, 23 û 30'an ku mafê zarakan yêñ "xwegîhandina zarakan ya çavkaniyê agahdariyê yêñ netewi û navnetewi", "Xwehînkirina li ser Bingehê Mafêna Mirovayî, Azadiyên Bingehîn û Huviyeta xwe ya milî" "bikaranin û pêşdexistina kultur, ziman û dinê eqaliyan" garanti dikin. Bi vî hawayî Tirkîyê de esasi de mafê jiyana zarokên Kurd qebûl nekîriye Bi sedan zarokên ku bêmal mane û ji hemû imkânên tendurustiyê bêpar in pêrgiyê mirinê bûne. Enfeksiyonen roviyan û ên riya bîhvedanê

berbelav bûne. Xwedîkirina di rewsek dijwarî de jiyana zarakan tehdîd dike.

7- Heyeta me daxwaza piştgiriye li hemû partiyêñ siyasi, rîxistinê demokratik yêñ netewi û navnetewi, li hemû ronakbîrên welêt, parlamenteñ dike ku ji bo gelê herêmê nîşan bidin. Em diben werin bibin sirîkê qedera gundiyêñ Şirnexê. Heftekê, deh rojan bi van gundiyan re bijin ku ji cî û warêñ xwe hatine avetiñ. Mil bidin têkoşîna van gundiyan ku naxwazin erdê bav û kalan û malen xwe bicî bîhelin.

8- Merkezên herêmê yêñ wek Silopiyê, Cizirê, Nisêbînê, Kiziltepê ku aboriya wan li ser ticareta bi Iraqê re ye, iro bûne wek "bajarêñ mirî" em peyvek Tirkî nabînin ku kanibe halê dijwar yê esnafan teswîr bike. Barê Krîza Delavê Basra bi esasi ketiye ser milê wan bajaran ku li ser Riya İpekê ne. Divê programek ji bo alîkariyek acil ji bo wan pêk bê da zerara wan telefi bibe.

9- Heyeta me bang li Heyva Sor, Xaça Sor û dezgehêñ alîkariyê yêñ netewi û navnetewi, paresgerên mafêna mirovayî û rîxistinê wan dike ku destê alîkariyê dirêjî gelê herêma Botan bikin ku ji cî û warêñ xwe hatine derxistin. Divê Rêxistinê Doktor û Dermanvanan bêñ li cih tehqîqan bikin û kampanyekê ji bo temînkirina dermanan vekin.

10- Yêñ ku di çareserkirina pîrsa Kurdi de li ser riya şiddetê îsrar dikin, bi her awayî gel ji xwe bi dûr xistine. Niha jî dixwazin vi "gelê bidürxistî" ji holê rakin. İro "mirinê qezayî" yêñ ku her roj rû didin, şewitandin gundan, zêdebenâ vegirtina konan li dorûbera bajar, qeza û qeseban, ger tedbir neyên wergirtin, mixalefetek demokratik neyê lidarxistin wê bibin sedemê qetliamên mezin. Em bangî her kesî, her kesî ku dibê "ez ïnsan im" dikin ku berpirsiyariyê xwe bîbirbînin û têkoşîn bidin.

### "Şer li dijî ...

Beyan, valakirina gundan, lêdan û işkence û kuştina gundiyan protesto dike û ji raya giştî ya demokratik daxwaz dike ku dengê xwe li hember van hovîti û bêqanûniya bilind ke. Beyan li ser rewşa gundiyan ji cî û warêñ xwe nefikirî ji vê yekê nişan dike:

"İro li herêma me, bi taybetî li dor bajarê Wanê û Siirtê ew kesen ku ji ser erden xwe hatine qewi-randin û di welatê xwe de hatine mişextkirin (miha-cirkirin) konê reş vegirtine, rewşa wan gelek dijwar e. Bê kar in, ji imkanen hindekariyê û tendurustiyê bêpar in, zivistan bi ser van de tê, muhtacî ciwarbûn û xwa-rin û ebûrê ne. Bi taybetî ji bo rewşa herî dijwar a zarokên di

navbera 0-2 saliyan de em bangî Heyva Sor û Xaça Sor û dezgehêñ alîkariyê yêñ din dikin ku destê alîkariyê dirêjî wan kin."

Yêñ ev beyana müşterek imze kirine ev in: Hetîp Dîcle; Serokê Komela Mafêna Mirovayî(KMM) ya Diyarbekirê, Av. Zubeyir Aydar; Serokê KMM ya Siirtê, Yavuz Bînbay; Serokê KMM ya Wanê, Salîh Ozturk; Serokê KMM ya Urfayê, Av. Murat Bilgiç; Serokê KMM ya Adiyemanê, Attila Kizilaslan; Serokê KMM ya Tunceliyê.

## Hindîk-Rîndîk

### Qebûl nake

Yekî Dimili-Zaza- li bin darê nimêja xwe dike. Pişti nimêja xwe diqedîne, selawatan tîne û dibêje:

- Yarebi ti qebûl biki (Yarabi tu qebûl biki).

Wê gavê ji yek li ser darê bûye, haya yê Dimili je tunebûye. Yê li ser darê dibêje:

- Ez qebûl nêkena (ez qebûl nakim).

Mêrik dibêje qey nimêja xwe çewt kîriye, radibe nimêja xwe ji serif ve dike. Ü dawiyê dîsa dibêje:

- Yarebi ti qebûl biki.

Yê li jor dîsa dibêje:

- Ez qebûl nêkena.

Mêrik dibêje qey desmêja wî şikayaye haya wî jê tuneye, dice desmêja xwe teze dike û cardin nimêja xwe ji serif ve dike. Pişti ku nimêja xwe diqedîne dîsa wek hercar dibêje:

- Yarebi ti qebûl biki.

Yê li ser darê jî dîsa ji heramî dibêje:

- Nê, ez qebûl nêkena.

Li ser vê, mîrikê Dimili edî hew xwe radigre, dibêje:

- Law ti nêkenê meke, (law tu qebûl naki meke), ji .... min ve...  
- Yarebi ti qebûl biki.  
Yê li ser darê wek her car dîsa dibêje:  
- Nê, ez qebûl nêkena.

### Çav kor be jî aqil heye

Jinikê xwest ji mîrê xwe yê kor re pesnê xwe bide, got:

- Mero, xwezi çavê te hebuya, te yê bidîta ka ez'a çuqas a pak û bi bedew im.

Yê kor got:

Jinê, erê çavê min kor e, ez bejn û bala te nabînim, iê ma aqilê min jî tuneye? Ku tu pak buya, ma te ez korê reben dikirim.

Amadekar: Z. Xamo

### Li dinê ev meh

Di 4'ê meha Çiriya Pêşin de du dewletên Almanî; Komara Almanya Demokratik û Komara Almanya Federal bûn yek.

Di 10'ê Çiriya Pêşin de 21 Filistinî ji alî leşkerên İsrailî ve hatin kuştin. Komîta Ewlekarî ya Netewên Yekbûyî ev bûyer bi yek dengî mahkûm kir.

Serokê Parlamento ya Misirê Rifaat Mahcub di 12'ê Çiriya Pêşin de li merkeza Kahîrê hat kuştin.

Di 14'ê Çiriya Pêşin de leşkerên Sûriyê êris dan ser leşkerên Michel Aün. Generel M. Aün hêzên xwe teslim kîrin xwe avete Balyozxana Fransayê.

Nîşana Nobel a Aştiyê serokê YKSS M. Gorbaçov stend.

Afrîka Başûr dest ji holêrakirina aperteizmê kir. idare Orfi ji holê rabû.

Fransa ji çekên xwe yê atomî 1/3 wê îmha bike.

Biryara reforma aborî li YKSS di civîna Sovyeta Bilind a di roja 12'ê Çiriya Pêşin de bi piraniya dengan hat qebûl kîrin.

Di 24'ê Çiriya Pêşin de di hilbijartina parlamento ya Pakistanê de serekwezira berê Benazîr Butto wenda kir.

Iraq hejmara leşkerên xwe yê li Kuveytê roj bi roj zêde dike. İro hejmara leşkerên Iraqê ku li Kuveytê ne 400.000 in. DYB biryar girt ku 100.000 leşkrêñ din jî bişine Arabistana Suûdi.

Hukûmeta Çekoslivakyayê biryar da ku çend tûmên xwe yê taybetî ji alî çekên kîmyayı ve hatine gîhandinê, bişine Arabistana Suûdi.

Gotûbêja di navbera hukûmeta El Salvador û FMLN de ya ji bo aştiyê û çekdanînê dom dike û hemû partiyêñ din jî di vê gotûbêje de ciyê xwe digrin.

# KOMUNİSTEY Ú NUŞTİŞE KIRDKİ (ZAZAKÎ)

Ê ki muhîmeya nuştişê Kirdki (Zazakî, Dimilkî) fam kenê û bi Kirdki ya nusenê roj bi roj vêşeri benê. Ki ma tenya bewniyê gazete ú mecmu'ayanê Kurdan ê nê menganê peyenan ra, bolkiyê ci ca dayo Kirdki. Bi cadayîş a tenya nêmendê, muhîmeya Kirdki ser o zî çiyê erjayey nuşte. Kes bi na jewer a zaf kîfweş beno. Çimkî no raveyiyayış qandê yewbiya-yîşê (jewbiyayışdê) mileta ma zaf muhîm o.

Nezdîyê se serr o ki o yo bi Kirdki nuseno. Zeki yeno zanayış, sîfte 1898 di Ehmedê Xasî bi Kirdki ya Mewlidê Nebî (Mewlidê Kirdi) nuşto. Ey dim a, 1903 di 'Usman Efendiyo Babîji, Biyîşê Pêxem-berî (Mewlûda Nebî) nuşto. Nê her di mewlidî zî bi herfanê 'Erebî nusiyayê, labelê Mal-misaniji ê tadayê herfanê Latînkî û Hêvi di çap kerdê (1).

Ehmedê Xasî û 'Usman Efendi dim a zî dem bi dem Kirdki nusiyayô. Ma vajê 1963 di bi nameyîndê Kirdki ya mecmu'ayê viyyaya ú fina (raya, gilanga) verêni ca dayo Kirdki. Nameyê na mecmu'a Roja Newe, wahêrê ci zî Dogan Kılıç Şîhhesenanalı bî. Dogan Kılıç nika Norweç di roşeno (2).

Ewro o yo Armanc, Berbang û Berhem di bi awayêndo bi dûzan a Kirdki nuseno. Kurdistan Press, Roja Nû, Dengê KOMKAR, Rê, Çarçira û tanî mecmu'ayê bînî ge ge ca danê Kirdki. Bi a min a, ki îmkânê nê mecmu'ayan û gazeteyan bibo ê zî do tim û tim ca bidê Kirdki. Çimkî nê embazê ki nê gazete ú mecmu'ayan vejenê zî wazene Kirdki bîro nuştiş.

Hûmarê Niştimanî û Demokratî yê peyenî zî kewtî mi dest. Embazê ki nê mecmu'ayan vejenê zî qerar dayo ki bi Kirdki ya binusê û muhîmbiyayışê nuştişê Kirdki ser o çiyê başî nuşte. Ez semedê nê qeraranê nê embazan ra zaf zerweş biya, ez eynan rê serkewteni wazena. Labelê tanî çiyê Ki R. Pironijî derheqê nênuşiyayışê Kirdki di, Demokrat di nuşte, raşî niyê. Ez wazena tiya di eynan raşî bikera. Verî ma biewnîyê ka R. Pironij se vano.

R. Pironij vano ki "...La aw wexto g'ra Kird ma bîy 'komonist' û 'sosyalist' zimon Kird bin ra xwi vîr a kerd. Yîn bi zimon Tirkon dest bi demogojî o felsefekerdî kerd. En Kird ma gi xwi ra vatê 'komonist' yon 'sosyalist' fikir xwi bi zimon Tirkî vila kerdîn. Yîn ideoloji, fikir o pêro çiy xwi Tirkon ra bonder bîb (musyayî b'). Ayê ra pey, vatên qay bi zimon Kirdî kî nêşen 'hewl' binus, biwon o 'galon hewlo' (demagoji) bik. Semed ayê ra, nuştiş o wendis zimon Kirdî sey diyalekton Kurmonci o taybetî Zazakî zaf peynî d' mend." (3).

Zeki aseno R. Pironij nênuşiyayışê Kirdki û bi "taybetî Zazakî (Kirdki, Dimilkî) rê Kurdanê komunîst û sosyalîstan ze sebeb vîneno. R. Pironij kam o, ez bi xo ci nêşinasnena (nêsil-asnena).

Winî aseno ki Kird (Zaza) o ú newe hewn ra werîsto labelê tesîre hewnî ra weş xo nêreyay. Ez hêvî kena ki çimanê xo baş bivilêno ki rind haya bo û raştanê tarîxî şâş nêvîno.

Ti vanê qey unîversitey, akademî, mektebî, gazetey, mecmu'ay, radyoy, televîzyon û metbe'eyê ma Kurdan, bi "taybetî Zazakî" estîbî, Kurdanê komunîstan û sosyalîstan heme kîlit kerdî.

R. Pironij şeno fikiranê Kurdanê komunîstan û sosya-lîstan qebûl nêkero, şeno eynan ra hes nêkero. Labelê na mesela di bi awayêndo eşkere ya negekerdiş (iftîrakerdiş) çido weş niyo. Çimkî ê ki mesela nuştiş û wen-dişê ziwanê Kirdki - çi Kurmançî ci Kirdki- di risipî yê û çareakerde (çaretokerde) yê, Kurdê komunîst û sosyalîst ê.

Fikrê komunîsteý û sosyalîsteý, bîkî serranê 1970 di Kurdistanê Corêni di vila bîy; gorey fikiranê komunîsteý û sosyalîsteý çend partî û organîzasyonê siyasi vîrziyay. Kurmançî û Kirdki zî bîkî no deme di û bi rîbereya Kurdanê komunîst û sosyalîstan a nusiyay. Ma vajê Tîrêj, Roja Welat, Devrimci Demokrat Gençlik, Özgürlik Yolu, Rizgarî no wext di viyyayê. Tîrêj di tenya Kurmançî û Kirdki nusiyayê. Roja Welat, Devrimci Demokrat Gençlik û Özgürlik Yolu di zî Kurmançî, Kirdki û Tirkî nusiyayê. Baş o, wexto ki nînan bi Kirdki û Kurmançî ya nuşte, R. Pironij û è Kurdê welatperwerê ki komunîst û sosyalîst nêbî kilawda min bin di bî, kotî di bî? Verê sosyalîstan partî û mecmu'ayê eynan esîbî, wa R. Pironij biewnîyo ka nê mecmu'ayê di bi Kirdki çend riperî estê? Ma a zî ca di verdê, ewro ê yê nê wareyan di çi xebati kenê? Nika zî ê ki mesela nuştişê Kirdki di çareakerde yê fina komunîst û sosyalîst ê. Kurdistanê Corêni di inanê ki Cûnta 1980 dim a dest bi nuştişê Kirdki kerd û des-pancês serrî ceza werdi, kewtê işkencexanan û zîndanan fina Kurdê komunîst û sosyalîst nîyê? Medya Güneşî û Deng ney rî nimûneyê vera çiman nîyê? Ê ki ewro mehkemeyanê faşistan di semedê mudafa'a (sa-vunma) Kirdki bi camerdey xo ver o danê, ziwanê xoyê şîrînî ser o işkencexanan û zîndanan xo çim a kenê ancî kurdê sosyalîst nîyê? Teberê welatî di zî no wina yo. Ki kes kitabanê Kurdkîyan ê çapxaneyanê Roja Nû, Jîna Nû, Çapxana Çanda Kurdi, Çapxana Çanda Kurdistan û ê bînân nêhesibno raşte di çi maneno? Ki ewro Armanc, Dengê KOMKAR, Kurdistan Press, Berhem, Kulîlk û ê bînî vînderê Kirdî do ci bîwanê? Beno ki nê qiseyê raşî weşdê R. Pironijî nêşirê labelê ê kesê ki nê karan kenê % 90 (se ra neway) ci sosyalîst ê.

Nê çiyê ki mi cor di nuşti, nînê o me'na ki Kurdê komunîst û sosyalîst bîncaran xetayan nêkenê û qe kemaneyê eynan çinê. Kemaneyê Kurdanê komu-nîstan

## Haydar DILJEN

û sosyalîstan zaf ê labelê kes ganî raseyi nênimno, mesela ziwanî di risipîneya eynan, Kurdanê bînan ra hîna vêşer a.

Bi nê qalanê (qisanê) xo yê corênan a meqsedê mi werdiya-yîşê Kurdanê welatheskerdoxan niyo. Raya xoserbiyayışê welatê ma di her Kurdo welatheskerdox wahêrê rolî yo û erjaye yo. Ancî, na ray di Kurdi heme, yanî ci komunîstî, ci sasyalîstî, ci welatheskerdoxî; heme şenê pi ya qandê welatê xo bixebitê. Ewro xirabkerdişê beytarê (mabênê) nînan û pê rî dişmenkerdişê ci di menfe'etê şarê ma çino. Qandê cûy, kesê zey R. Pironijî ganî fek nege û botanan ra vera dê û bêrê mînderdê raştey ser.

R. Pironij vano "EZ dekewn miyon ay imbazon, ay imbazî g' ver 5-7 seron ra dest bi nuştiş Zazakî kerd. Ez von qay ma erê nîmend." (4).

Zeki mi vernî di zî beli kerd, Kirdki verê 5-7 serran ra nê, nezdîyê se serr o ki nuseno. A bîni zî, R. Pironij nuştiş Kirdki di berey (erey) nêkewto, hewl keno ki Kirdki nuseno labelê fekeştişê sosyalîstan rî, negekerdiş rî zaf berey kewto. Ki hîssî niyo û ki çarçewada welatheskerdoxey di samîmî yo, ganî goreyê menfe'etê welat û şarê ma raşt vajo, raşt binuso.

R. Pironij, çirê nênuşiyayışê Kirdki rî kolonîkerdişê welatê ma û yasaxkerdişê ziwanê ma sebeb nêvîneno, herûnda nînan di Kurdanê komunîstan û sosyalîstan sebeb vîneno? O bi nê qisanê xo ya leke ano demokrateya Demokratî ser zî. Zeki temamîya nuşteyê (yaziyê) mi di zî aseno, ez nêwazena Demokratî bikera şîrîkê fikiranê R. Pironijî labelê embazê ki Demokratî vejenê ganî nêverdê demokrateya Demokratî rî leke bîro.

Ê gêjê ki vanê "ma Kird nîy, ma Zaza y" û mileta xo ïnkar kenê senî zîrî danê mesela şarê Kurdistanî ro, negeyê zey negeyanê R. Pironijî zî zîrî danê raştey ro. Embazê ki bi Kirdki (Dimilkî, Zazakî) nusenê roj bi roj vêşerî benê. Bi na jewer a ma yê zaf şâ benê. Beno ki ma tanînî rew dest pa kerdî, tanînî bere; no zaf muhîm niyo, oyo muhîm dest-pakerdiş o. Mewlidê Nebî yê Ehmedî Xasî ra heta ewro xeylê embazan xo no ware di 'ediznayo (betilnawo, qefîlnayo). Ma yê bi sayedê tecrubanê nê embazan a ewro bi Kirdki nusenê. Ê ki ma dim a bîrê zî do tecrubeyanê ma ra fayne bivinê. Qandê cûy icab nêkono ki merdim dekewo kompleksa xonizmîvinayışî.

1)biewnî Hêvi, kovara çandîya giştî Paris, hûmar: 4 (ilon 1985), riper: 75-110

2)biewnî Malmîsanî & Mahmûd Lewendî, Li Kurdistana Bakur û li Tirkîye Rojnamegeriya Kurdi, 1908-1981, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1989, riper: 159

3)Demokrat, kovara rézanî û çandî, Berlin, hûmar: 8 (Hezîran 1990), riper: 23

4)Demokrat, hûmar: 8, riper: 23

## MÊRDEYÊ DÎ CİNÎYAN

Arêkerdox: Koyo BERZ

Wextê di milayêdê camîyê beno. No mila hergi roj wextê ezandê şefaqî nêşeno aya bo, xo ezanî ser resno û ezanî wextê ci di biwano (veyn do). Wext beno mila hewn di maneno, wext beno wextê ci di nêşeno bîro camî.

No, hergi şefaq yeno camî ki jew mîrdeker camî di ronişte yo. Rojê mila nê mîrdekerî ra pers keno, vano:

-Dostê mi, qisûr mewnî, ez o kena to ra çiyê pers kera.

Mîrdeker vano: -Beno, pers ki.

Mîrdeker vano: -Ti senî kenê ti hendayê rew hewn ra werzenê û hergi roj wextê xo di yenê camî? No di mengî yo ez o winêna to qe rojê se'ata xo şâş nêkerdi û wextê xo nêravêrma. Ez senî kena senî nêkona nêşena wextê xo di werza û bîra ezan biwana. Heta nika rojê ez wextê xo di aya nêbiya, ezandê şefaqî ser nêresaya û wextê ci di mi ezan nêwendî. Ti senî kenê ki ti wina rew werzenê? Mi rî zî vaci, ez zî zey to bikera û rehatay a ezanî ser resa.

Mîrdeker vano: -No bol û bol rehat o, ney rehatêri çîna çînîyo.

Mîrdeker vano: -Senî rehat o? Mi rî zî vaji.

Mîrdeker vano: -Ti zî zey mi kenê.

Mîrdeker vano: -Senî?

Mîrdeker vano: -Çend cinîyê to yê?

Mîrdeker vano: -Jû wa.

Mîrdeker vano: -Nêbî, jû cinî bes nîya. Qandê coy ti yê hewn di manenê û nêşenê wextê xo di werzê. Bewnî, ê mi di cinî yê, qandê coy ez o rew werzena û yena. Jû mi aya nêkero a bîni mi aya kena. Rew ti zî cinîyê xo didi ki. Xo rî cinîna bîya ki ti wextê xo di werzê û ezandê xo ser resê. Wina şiro, do to milayey ra çê kerê. Goş a mi ni û xo rî rew cinîna bîya.

Mîrdeker vano: -Mîrdeker vano: -No bol û bol rehat o, ney rehatêri çîna çînîyo.

Miyabeyn ra mengê di mengî ravêrénê, jû şefaq mîrdeker yeno ki mila yo camî di ronişte. Ti nêvanê mila nîmedê şewi ra ameyo û camî di rakewto.

Mîrdeker milay ra pers keno, vano: -Bewnî dostê mi, to goş na a mi û to cinîyê xo kerdî didi, ti verê mi hewn ra werîstê amey camî. Bewnî, kes senî wextê xo di hewn ra werzeno? Ney a tepeya ti wextê ezanî nêravêrnenê.

Mîrdeker vano: -Ti yê hewna qisey kenê û henekê xo bi mi kenê? Qisey meki û çimandê mi ver a vinîbi, wa ez to nêvîna! To key mi xeripna, to ez xapeynaya û kerda zey xo. To key mi veşna. Di cinî nêverdanê ez rakewa û hewn bikera. Mi herey kerdî, goş na a to û cinîyê xo kerdî didi. Mi adir na keydê xo ya, mi keyê xo veşna. Aqîlî merdimî bîbo merdim zey heran a di finî nêzewijîyêno, cinîyanê xo didi nêkono. Jû cinî vêşî ya, heta didini reso. O ki cinîyanê xo keno didi, zey mi bêaqîl o. Di cinîyan key mi veşnayo, rew mi ra dûrî kewi, wa ez to nêvîna!

## MA NEEŞKEN

Sér 'ard xwe (xue) d'

Bîn 'azmûnd' xwe d'

Ü weletî xwe d'

Ma nîeşken deyîrûnê xwe vac.

Miyûnî hêgûnî xwe d'

Sér mişonê xwe d'

Pey citê xwe d'

Ma nîeşken deyîrûnî xwe vac.

Sér koyund' xwe d'

Bîn qilûn xwe d'

Miyûnî mergûnî xwe d'

Ma nîeşken deyîrûnê xwe vac.

Sér warûn xwe d'

Vér kuemon xwe d'

Pey meşkûnî xwe d'

Ma nîeşken deyîrûnê xwe vac.

# Kîn û Evîn

Destpêk r. 8

gihste laşê wê. Tevizinok bi gewdên wan ketin. Doktor Husnî agirê evinê gurtur kir û ne li gora rewşa ew têde bûn, bi ramûsana çû pîreka xwe. Hêdi-hêdi ber bi lîvîna çûn.. û pêlên evinê hilatin û dahatin. Ev cara pêşî bû ku dikariya bê şerm gewdê xwe bi yê mîrê xwe ve berde bû.

Zû bi zû lerzên xweşiyê pêve hatin û ji nişkave gîriyekî histirî ew girt û gîri û ahîna hevgihistinê tevlihev bûn. Lê belê gîriyê Şukriya, ne gîriyê li ser miriyan bû, ew furandina neşweta herî bilind bû.

Hakim ji ev tişt dît û bîhîst. Bêpêjin rabû ser xwe û derket. Û heya qonaxekê ev qerîn û ahîn di guhan de man. Lê di rûçikê

wî de, ne dihate xwiya kirin, ew ji ber zilamtiya Doktor Husnî zîvîr bûye yan, ji matmayî maye. Lâ belê di nava xwe de got: "Ezê binêrim dê çilo here mirinê."

Destê elindê, çaxa berê Doktor Husnî dane sêpiyê, bûyerên ku di jiyana wî de pê re derbas bûbûn, seeta dawiya bi Şukriyê re, li ber çavên wî diçû û dihatin. Ü qerîna giriya wê di guhêne wî de dikirin zinginî.. Dema çavên wî li sêpiyê ketin, kîn û hezkirinê ew girt. Wext teng bû.. Êdî wî nema dikaribû wan di jiyana xwe de bi kar bîne. Tenê wî fam kir ku mirina bi mîranî ya di ber welat de, hezkirina bê sînor dide xwiya kirin û di eynî wextê de kîna bi dijmin re,

didomîne.. Wî gavêni ji xwe ewle avetin.. Rê neda kesi... Bi xwe çû ber sêpiyê, hilkîşıya ser kursiyê, werîs xiste hustiyê xwe û bi xwe lingê xwe li kursiyê xist... Di vê bisûkê de, tiştê ku dikaribû bikira ev bû..

Kêlikêk bi ser de neçû, giyanê merovekî mezin ji dînyayê bar kir... ...Hakim, li gora ku di nava xwe de, biryar stendibû, heya dawiyê qelewiziya Doktor Husnî kir. Di bistîka herî dawî de, şewqê xwe ji serê xwe kir, xwe çemand, paşê bi lez berê xwe jê guherand û bîriya xwe de çû...

## Kesê bê îdeolojî wek kaptanê bê pûsûla ye

Destpêk r. 4

rast e em iro rabin bibêjin ji me re partî, komel û heta mekteb "navê", cîmkî me armancek pîroz heye! Ev dîtinek çewt e, daxwazek ne rast e. Gava em dîtinek wiha qebûl bikin, divê em siyasetê ji bin de boykot bikin û bibêjin, ji me Kurdan re siyaset "navê", cîmkî me armancek pîroz heye.

### Cewtî di ku de bû

Ez wer bawer dikim ku çewtî ne di avakirina partî û komelan de bû, çewtî ne di siyasîbûna me de bû, di dîtin û zanebûna me ya partîtiyê û komeletiyê de bû. Kes nikare bibêje ku bi kirina karê siyasi me çewtî kir! Lê me di meşandina karê siyasi de çewtî kirin, nezanî kirin. Ev tiştîk din e. Meriv xwedî erebe-texsî be ne xerab e, heta ji bo rehetiya dînyayê îmkanek baş e. Lê meriv bê ehliyet be, nizanibe wê bajo û ji ber vê nezaniyê ji here erebî li binê guhê diwerekî xe û dûre rabe bibêje, "ji me re erebe navê, cîmkî me pê qeza kir û bû sebebê mirina hin kesen me", ne tedbîrek rast e. Hela hela gava meriv rîwiyê riyek dûr be û bibêje "ji me re erebe navê"- numûne dikare teyare, tirê, ya ji gemî betew ji bin ve ne rast e. Ya çêtir ewe ku meriv fêrî ajotina erekê bibe û bibe xwedî ehliyet. "Boykotkirina" erekê ne tu rê ye, dîtinek îpîsîai ye.

Erê bi navê îdeolojîyê, siyasetê me gelek çewtî kirin; ev qebûl. Ev aliyeke meşleyê ye. Lê aliyeke meşelê yê din ji heye ku li gel hemû nezanî û çewtiyan, me gelek tiştîn baş ji kirin, me gelek mew-ziyen hêja ji qezenc kirin. Berî her tiştî ji ber ku me "îdeolojîyek" hebû, me ji bo rizgariya welêt û azdiya gelê xwe xebat kir û bi hezaran şehîd da. Bi saya vê xebatê tevgera gelê me ya netewî û demokratik hat vê merhela iro. Divê em vê rastîyê ïnkar nekin.

### Tevgera Netewî Bê îdeolojî Nehat Vê Merhêlê

Heger em dîtina N. Kirîv rast qebûl bikin, wê gavêne "îdeolojî" tenê, divê em bibêjin, ji me re partî ji "navê", komel ji "navê". Cîmkî me bi navê komel û partîyan ji gelek çewtî kirin. Gelek caran dijayedî dihatin wê nuxtê, te digot qey me partî ji bo ku em li dijî hev şer, bikin ava kirine. Ev menşâlîte iro ji hîn ji bin de neşkiyaye. Me dixwest em mekteban ji wek partîyan xwe idere bikin û hwd. Lê ji ber van çewtiyan ku me li ser navê komel û partîyan kirin, ne

bijartîye, ev îdeolojî parasitîye ez serbilind û bextiyar im.

### Divê em berê derziyê di xwe ra kin..

N. Kirîv gotiye, "Di pirsa yekîtiyê de ji îdeolojî bi serê xwe rola mestirin dilîze û li ber yekîtiya giştî bûye astenek."

îddiayek wiha bê bingeh e û ne rast e. Bi rastî heger wiha be, wê gavê divê meriv bibêje, kes û hêzên xwedî îdeolojî tu carî nikarin yekîtiyê çêkin. Lê belê di vi warî de bi hezaran numûne hene ku vê dîtinê pûc dîkin. Hema em bala xwe bidin burjûwaziyê Tirk, ma gava hewce be li hember gelê me nabin yek? Bê şik dibin. Him ji ne tenê di nav xwe de, bi hevalbendê xwe yên derive re ji dibin yek û paxtan ava dîkin. İcar ne tenê burjûwazî, hêzên sosyalist û pêşverû ji bi îdeolojîyên xwe ve dikarin bêna ba hev û yekîtiyan ava bikin. Ji Vitettinamê bigre heta Afrika Başûr bi sedan nimûne hene. Wê gavê çewtî ne di îdeolojîyê de ye, di "însan" de ye, di kadroyen siyasi de ye. Ya rast divê tevî îdeolojîyên cihê meriv cardin ji karibe yek siyasetê bajo û di warê siyasi de refân xwe bike yek. Ger me ev nekirîye, sebeb ne îdeolojiye, em in. Gava meriv ji heq siyasetê dernekeve, dixwaze bira meriv îdeolojîyek biparêze ya ji neparêze, neticê naguhere; meriv tim wenda bike. Ez dibêjim rewşa me ji kêm zede wiha ye. Ji ber vê yekê ji divê em berê derziyê di xwe re kin, dûre şûjinê di îdeolojîyê re kin.


Çava ku kapitanek bê pûsûla nikare berê xwe bide oqyanusîn bê serî û bê dawî, her wisa Kurd ji bê siyaset, bê felsefak jîyanê, yanî bê "îdeolojî" nikarin bighîjin armanca xwe ya "pîroz." Ji ber vê yekê ji divê Kurd ji her kesi bêtir bi van mefhûman mijûl bibin û wan hezim bikin. Lê divê tim û tim, xwe ji dogmatizmê biparêzin.

1- Materyalist Felsefe Sözlüğü r. 226

2- Ansiklopedik Edebiyat Sözlüğü r. 356, S.K. Karaalioğlu

3- İktidarın ideolojisi ve ideolojinin iktidarı -Göran Therborn, Neqîkar: M. C. Anday, Cumhuriyet Dergi 10.08.90

4- Felsefe Sözlüğü/o. Hançerlioğlu. r. 200



Amadekar:  
S. Réving

c- Zirdîn, dînê temam 5- a- Ji navê qizan b- Sayfa, sahîfe 6- a- Erd, dar, ax, yan cilê niv ter, nîv zuha, b- hejmarek 7- a- Bi soranî "wacib", "wezîfe", b- Di Kurmancî de peyva vegetandekê ji bo peyvén nîr ku ciyê navan digre. 8- a- Mecliseke idara welatan b- dîn, ayîn. 9- a- Goştê diranan (berevajî) b- Li Kurdistana Tirkîye navê bajarekî ku serokê serhilîdana 1925 an Şêx Seîd jê ye. 10 a- Du herfîn dengdar b- nû, nuh (berevajî) c- Kesê ji Finlandiya 11- a- Li cihêñ têr ciya, çala liser keviran ku gelek cara teji av e û mirov avê jê vedixwe (berevajî) b- Li gundan dema xaniyekî ava dikin, banê wî piçek bi meyîl ava dikin ku ava baranê ji ser birije. Ji wê meyîl re cî dibêjin? 12- a- Li gundan çiya malbatên xwedî pez, li nêzî çêra pez, yan li dûrî Gund xaniyekî ava dikin ku alîfê pezê xwe, yê zivistanê tê de diparîzîn b- Hejmarek.

vajî) 10- a- êüna ziyareta kesekî, malekê. (berevajî) b- Navekî kuran (berevajî) 11- a- serab 12- a- Ne, no, nexîr b- Dayîk, c- Navê rojeye heftiyê (berevajî)

Serejêr: 1- a- êş, kul, kovan b- Cihê ku mey lê tê vexwarin 2- a- Ne kovî (berevajî) b- dewarek c- Di Kurmancî de peyveke pevgirêdanê 3- a- Bi bîr anîn, b- bi kîrê, yan bi neynûkan û bi armanca paqikkirinê, kolana tiştekî. 4- a- Ard, b- Rengek

### Bersîva hejmara 107-108'an

Çeperast: 1-a) Çarçira. b) ardû. 2-a) ib. b) êvitîn. c) ïn. 3-a) vad. b) ez. c) kron. 4-a) êdad. b) gavan. 5-a) law. b) gare. c) reş. 6-a) nil. b) radyo. 7-a) av. b) agir. 8-a) êvar. b) bab. c) alî. 9-a) varîk. b) teşen 10-a) vt. b) ra. c) da. 11-a) iro. b) dest. c) şeh. 12-a) nanopêj. b) avahî Serjêr: 1-a) çivîl. b) sêvdîn. 2-a) Abadan. b) va. c) ra. 3-a) dawî. b) arvan. 4-a) çê. b) larit. 5-a) ive. b) dê. 6-a) rizgar. b) kej. 7-a) at. b) Ararat. 8-a) ikved. b) berta. 9-a) anra. b) ya. b) şâ. 10-a) onrogan. b) şâ. 11-a) dîn. b) il. c) deh. 12-a) ûn. b) şîrînahî

# Rizqê Melê

Mele Nezîr serê bîst salane li gundê ku lê rûdine meletiyê dike. Meleyekî di halê xwe de ye. Cûn û hatina wî ji meletiya camiyê, ji camiyê heta malê ye. Xeynî rojêna ya ji nexweşiyekê mele deriyê kesî venake.

Axê gund car carna gazinan dike: Çima gundî tev diherin cemaata wî tenê mele rojeke ji nahatiye ber deriyê wî? Li gel piraniya melan, hatina wan zekat e û zekata pîr ji a axê ye - hin ji wan ne ji dil bin jî loma jî çûn û hatina wan ya bi ber bi mal û ser benderên axê zêdeye. Lê mele Nezîr, çavê wî ne li malê dînyayê ye. Kar û barê wî ji bo axretê ye. Nanê rojê, zikterî besî dîlxwesiya wî ye. Çiqasî halê wî nexweş be ji, wexta ku jê tê pîrsîn, bersîva wî "elhemdûlîlah" e.

Sal ji salan xerab diçê. Baran nabere, ya ji hindik dibare, hatin ne wek hersal e. Para melê ji kêm e. Ji ber ku êm ji kêm e heywan ji ne weke hersal bi bereket in. Zivistanê halê mele çiqas diçê xerabtir dibe. Meha sibatê dawiya qût tê. Rojekê bizina kol, rojekê çêleka beş, dawiya heywanan ji tê. Ne nan, ne qût û ne ji heywan, li malê tiştek namîne. Mele, xanîyê rût û zarokên xwe. Çend rojan bê xwarin li malê dimîn. Mele li camiyê bi cemate nade fêm kirin. Lê çare namîne radihêje zarokên xwe rast dihere mala axê. Axa li oda jor rûniştiye, bi bankirina jina xwe pê dihese, ku mele, zar û zecen xwe bûne mîvanan wî. Axa bi vê yekê gelekî kîfxwesî dibe. Ji aliye hatina melê nefsmezinbûna axê tatmîn dike, ji aliye din ji jê re dibe meraq. Lê axe xwe giran dike, da ku mele bi xwe sebebê hatina xwe bibêje.

Rojen pêş bi şenâî derbas dibin. Zarokên axê hevelen nuh ji xwe re dîtine, axatiya axê carek din bûye, cemaata jin û bûkên axê ji ges bûye. Rojek, dudu....deh, panzde pişti çend rojan nexweşî ket nav zarakan kîfxwesîya jinan ji sar bû. Axê nema xwe girt, ji mele pîrsî:

- Seydayê min, ma rîwîtî heta ku derê ye? Mele:  
- Hema heta vira.

Axe hinekî şas ma lê dîsa pîrsî:

- Çawa yanî?

Mele qasekî fikirî û paşê dest pê kir. "Çend şevan berî ku ez werim mala te, min xewnek dît. Ez li paş çiyayê Qaf bûm. Min dît bi mîyanan kanî diherikin û zilamek

jî defterek di bin çengê wî de li nav wan kaniyan diçê û tê. Ava hinek kaniya bi gurre gurr û ya hinekan jî dilop dilop diherikî. Min gelek meraq kir. Ez ber bi wî zilamî çûm û min jê pîrsî:

- Tu kî yi, ci kesî û mana van kaniyan çiye?  
Di bin çavan re li min nîrî, bi dengêkî hişk:

- Ez melekê rizqê insan im. Li gor emrê Xwedê rizqê wan eyar dikim. Evan kaniyan jî her yek a mirovêkî ye, li gor rizqen wan diherikin.

Wexta ku wer got, ji min re bû meraq, gelo kijan a min bû. Min xwe ne girt û min jê pîrsî:

- Ji kerema xwe re tu kanî kaniya min nîşanî min bidî?

Navê min pîrsî, deftera xwe vekir û ez birim ser kaniya min. Hema ji seetê bi zorê dilopek jê dihat. Wê çaxê tu hatî bîra min. Gelô wê kaniya te çawa bûya?

Min ji melek rica kir da ku kaniya te jê nîşanî min bide. Got:

- Ku tu yi yeka din jî ji min ne pîrsî ezê nîşanî te bidim.

Min got bi soz, ez yek din napîrsim.

Dîsa li deftera xwe nîrî û em çûn ser kaniya te, gurre gurra kaniya te bû. Karê melek hebû ew çû û ez mam li wir. Ez qederekê fikirîm û min ji xwe re got: kaniya axê çawa be gur e, ez ji hezâr yeka wê berra ser a xwe bidim wê ewê jî pê ne êse û wê halê minê jî hinekî xwes bibe. Timayî di dilê min de xurt bû û min wer kir. Min qurna(mûslixa) kaniya te bi qandî derecakê bi aliye çepê û a xwe jî hew qasî bi aliye rastê ve zîvirand.

Kêfa min dihat zarokên min ji wê pariek nanê germ bixawara. Lê kêfa min li min şikest. Min dîtina ku dît melek li ba min e, deftera xwe vekirî û li kaniya te dinêre. Zanibû ku bi qurnê te hatiye leyîstin. Ji min pîrsî, min tevi sebebê ku min cîma kiriye, min jê re got. Ez birim ser kaniya min, qurne heta dawî li milê çepê zîvirand, êdî hew ne ma dilop jî hat. Em dîsa hatin ba kaniya te, ava kaniya te zêde kir, min bi çav ferq nekir lê li gor gotina wî dilopên kaniya min ji ketin ser kaniya te. Yanî rizqê min jî tevî rizqê te bû. Ü ji bo vê yekê jî ez li mala te me. Belkî hinek zêdeye, lê ez rizqê xwe dixwim."

Divê di nav me de bimîne lê ez ji van rojan li axe kî digerim....

M. Botan

## Fîşa abonetiya Armancê

Salek  
 Şes Meh

Abonetiya salekê	
Li Skandinavya	120 Skr.
Li Ewrûpa	50 DM
Li derveyî Ewrûpa	35 \$

Tarîx: .....  
Nav û paşnav: .....  
Navnîşan: .....  
.....

Welat: .....  
Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgiroya jorê bişînîn. Fotoko-piya kvîtoya heqê abonetiyê û fişa jorîn dagirin li ser adresa jérin ji me re bişînîn.

Adres: P. Box 6004, 172 06 Sundbyberg/Sweden

## Ferhenga Literatûri

### Roman ci ye?

Ev nav li vî rengê edebî bû, çimkî ew cara pêşî bi zimanê Fransizî ku yek ji zimanê koma romanî bû, hatibû nivîsandin. Gelo rewistê romanê yên ku wê ji rengê eposê yên din cuda dîkin ci ne? Gelo roman di çi qonanax re derbas bûye?

Di vî warî de, rexnegirê Sovyetî M. Bextin dînivîse ku lêkolîna li ser romanê û destanê gelekî dijwar e. Li gora wî "roman yekemîn celeb e ku hîn forma xwe ya dawî nestendiye. Ü heya niha di qonaxa damezirandinê de ye." Bi xwe ev yek ji ew rewîste ya ku romanê ji destanê cuda dike. Çilo nîrînê rexnegiran li ser romanê wek celebek literatûri, ne wek hev in, wiyo ji, ew di nîrînê xwe de, li ser qonaxen dîrokî yên ku roman tê re derbas bûye, ne yek in. Her wiha jî nakokiye li ser hoyen çebûna vî rengê edebî, heye.

Ji ber vê yekê, ji hevderxistina rewîste romanê û naskirina qonaxen ku ew tê re derbas bûye, ne wiyo hîsan e. Wek nimûne; hin dibêjin ku roman di serdemâ Yunaniyan de, di sedsala 2-3'an de çebûye. Ew dibêjin ku "Dafnîs û Xiloya" ya nivîskar Lango yek ji wan romanen pêşî, ya wê demê ye.

Her wiha hin literatûrnas hene ku derketina romanê dispîrin Serdemâ Navîn. Wekû nas e, bi taybetî di vî qonaxa dîrokî de romanen siwaran şax û bax dan. Ji wan: "Kinistan û Zol" "Siruda Rolan" û "Strana Sît".

Lê belê em dikarin bêjin ku di sedsala 19'an de roman gihişte sewiyeke gelek bilind û bi firehî belav bû. Bi saya vî rengê edebî, literatûra hin gelan dengdanek navnetewî bi pey xwe xistin. Nimûna romana Rûsi tiştekî ber bi çav e.

Gelo cîma bi taybetî roman di

vê qonaxê de, ji hemû rengê edebî yên din bêtir bi pêş ket?

Literatûrnas vî tişti bi peywendiyê civakî yên serdemâriyê ve girê didin. Bi xwe ev fikir ji çavkaniya çemê Hegel ya ku dibêje "roman destana serdemâ burjuaziyê hatiye." Bi rastî ji ma ne cara pêşî xir û cirek di nav ferd û civakê de li ser rûpelên romanen çebûn. Ew ji, ji ber îdealen bilind û heynîa jîyanê ya tal û nîzîm tê. Li ser vê yekê gelek roman wek nimûne hene: "Medam Bovarî" ya Filobir, "Hêviyên Windayî" ya Balzak, "Anna Karîna" ya Tolstoy û "Birayen Keremazov" a Dostoyevskî.

Gelo termîna romanê kingê derbasî ferhenga edebî bûye û ji ku ve hatiye? Wekû nas e, bêjeya "roman"ê cara pêşin di dawiya sedala 12'an û destpêka sedsala 13'an de bi kar hat. Lê belê mana wê firehtir bû. Ji ber ku hemû rengê edebî di zimanê romanê de bi vî navî dihatin nasîn. Lê dûre, di sedsala 19'an de termîna romanê ma li ser rengekî ji yên eposê û heya nuha di vê çarçewê de maye. Ü ku li gora vê heyamê em romanê bidin nasîn, emî bîbêjin ew pirê caran pexşan e, bi hecmê xwe mezîn e û lehengê wê pir in. Ü ew ji ber pîrbûna xêzên pêşketina bûyeran(sujet) tê. Helbet ev rewîste ha yên şerî û tenê forma ji derve ne. Lê ferqên yên bingehîn ku roman e ji çiroka dirêj cuda dîkin ev in: Berî hertişî, ne wek çirokê ji çend bergeh û demanân digihê hev, lê bi xîlafa wê, ew xalîçak gitî li ser jîyanê ye. Bi gotineke din, roman di çerçewa hunandineke fenî de, dikare heyin û jîyanâ merovan bi firehî bide ber xwe; giyan, karekter û nîrînê wan yêng rengo rengo pêşçav dike. Ü pîrî caran di romanê de nivîskar jîyanâ lehengê xwe ji zarokiyê, heya mirinê dide ber xwe. Di vî warî de, gelek nimûne hene û yek ji wan romana Gonçarov "Ob-

lomov"e. Nivîskar jîyanâ lehengê yekemîn ji heft saliya wî heya mirinê, bi tonek hêdi hêdi, bêyi ku lezê bide xwe, pêşkesî xwendevanan dike. Pêwîst e bête gotin, ku roman rengê edebî yê yekemîn e ku dikare rengê din di xwe de bihewîne. Ew hunerek xurt û mezin e, wek derya bêser û binî ye.

Dibe ku pirsek dakeve meydanê; ma îmkaniyeta wiyo fireh, tenê di sedsala 19'an de, li ber romanê vebû? Ma cîma em nikarin navê romanê li berhemên Serdemâ Navîn û yên Yunaniyan bikin? Ma bi mefhumên nuh ew ne roman in? Di vir de, wê kevirê qorzi, berê leheng be. Heger di heyamên kevnare de, leheng, melek bûn, çar bûn, lê lehengê serdemâ burjûwazî merovîn normal in. Heger konflikti di berhemên kevnare de, di navbera dewlet û dewletan de bûn, lê di romanen sedsala 19'an û serdemâ me de, konflikti di navbera ferd xwe bi xwe ye, yan ji bi kesen li dora xwe re ne. Ü li gora nîrîna literatûrnasê Sovyetî Bextin;

1- Di vê leheng aliyê pozitîv û negatîv, henek û cidiyet, qencî û xerabiye di xwe de gewde bike.

2- Divê leheng ne li gora pilanekê bête dayîn, lê belê pêwîst e ew bi xwe li gora çerçewa jîyanâ ku ew tê de dijî, pêş de here rabe, yan bikeve. Bi vî hawayî, nivîskar wê bikaribe noqî hinava insan bîher tişti ji jîyanâ wî ya girîng ji me re bibêje. Mane ne bi derewa hatiye gotin ku romanek dikare bibe anşîklopediya jîyanâ geleki.

Ev nivîs bi alîkariya Siyamendê Sérîf hatiye amadekirin.  
(B. Nazî)

### ne karê aqila ye lê rast e

#### Amadekar: Hesen Mizgin

◆ Teleskopa Hubble dê bikaribe resmîn galaksên 20 milyar salên ronahiyê dûr bikşîne.

◆ Masiyê(yelken) li dinê lezîtirin masî ye. Di saetekî de 109 km diçê. Masiyekî din bi navê Wahoon dikare di saetekî de 77 km biçê.

◆ Li Danîmarkayê li bajarê Silkeborgê akvaryum tenê ji bo heywanen ku li Silkeborgê tê avakirin ji bo insana ye. Akvaryûm wê di bin ava golê de bête avakirin û insana ji hundirê akvaryûm dê bikaribin heywanen avî temaşe bikin. Akvaryûm dê di sala 1992'an de bête vekirin.

◆ Li Brîtaniya Mezin fabrikayek enerjiye ku bi çîrta mirîsha bişxule, ava dikin. Li gor hesebe ku hatiye kirin ev avahiya enerjiye wê nêzî 10.000 xanî germ bike.

◆ Li Almanyayê ji bo ciyê otomobilan refan ava dikin. Asansorek wê otomobilan li van refan bi cih bike û bîne jér ji bo xwedîyê otomobilîle.

◆ Li dinê ala (bayraqa) herî mezin li DYA, li Indianayê, di sala 1980'ê de hat hilkişandin. Giraniya vê ala ha 7 ton e.

◆ Babiyan(tewreke meymûna ye) dema ku hevûdû dixun, kêçen hevûdû top dikin û dixwin reaksiyonek biyokîmyayı nişan didin. Ev yek dike ku di mêjîyê van meymûnan de ciyê ku ji morfin, eroin û afyonê mest dibe, bi reaksiyonâ biyokîmyayı mest dibe û meymûnê serxweş dike.